

**Nivîs, helbest û vergerandinên**

# **Hemreş Reşo**

**ji Kovara Çiya,  
Hejmar 1-5**

Amedekar:  
Kitêbxaneya Kurdî  
Stockholm — 2006

## Piştî Çar Salan

Bi dirêjîya van çar salên bihorî em bûn armanca pir êrişên bêbav û renga-reng. Êrişkeran em bê dilovanî eşandin, tîrên jahrê li me barandin û bi harî dev avêtin me. Ne bi mêranî, lê bi xinizî tirba me kolan û bi gelek gotinên kirêt û bê sinçî zimanên xwe dirêjî me kirin...

Herwekî ku bingehe (hîm) van êrişan li ser derew, xweperestî hatibû danîn jî, bi dirêjîya van çar salan dengê me, ne bi nivîsîn û ne jî bi axaftin, derket. Em li mala xwe rûniştin.

### Gelo Çima?

Çawa ku ”bi destekî çepik lênakevin”, welatparêzî û xebata gel a rêzanî (siyasî) jî bi tenê nikare were kirin, merov her hewceyî heval û hogiran e. Gava em heval dibêjin, em ên dilsoz, xwenas û hevalên rojên teng tînin bîra xwe, ne ên sist û pist û ên roja xweşiyê: Lê pir mixabin ku hişyariya gelê me di bin nîrê zînata neyaran de bi livî-neke gelekî giran pêşde diçe. Li gor vê hêjmara dilsozan jî pir kême. Ev jî rê nade merov ku li gor dil û nasîna xwe hevalan hilbijêre. Em neçar dibûn destê xwe bidin her yekekî ku xwe Kurd û dilsoz dinavand. Eva jî tiştêkî xweristî (tebîî) ye ku di rewşên waha de pir keysbaz û xweperest jî diketin nav rêza me.

”Bi ewtîna segan karwan li reya xwe namîne” dibêjin, lê belê gava ev ”segana” ên karwan bi xwe bin û har bibin rewş tê guhartin. Bi belaşî nehatiye gotin ku ”ciyê hevalekî nerind hezar neyarên qenc çaktir in”. Em jî bûn goriyê hevalên qels û dilpaqijîya xwe. Gava hemu hêjmarên Çiya bi çakî werin xî aendin, tê dîtin ku em tucaran li şerê neyaran nerevîn û me xwe neda paç, kesek nikare vê rastiyê bişerrîne (înkâr). Lê piştî hewldana du salan me re derket ku van kesên fêlbaz bi zaneyî dixwazin me navno bikin, li ser reya rast derxin, têxin ser reya şaş û çepel û me bi şerê xwexweyî (sexsî) navwxeyî mijûl bikin. Dixwestin em bibin ûşta (hoy) dubenditî.

Sewê (jibo) ku ewana çak werin nasîn û derewên wan derkevin, me xwe girt û em li mala xwe rûniştin. Bi vê şelpeyek mezin li wan ket, dawî heryek li wan li quncikê xwe veket û dengê xwe birrî. ”Ro bi celbê nehate veşartin”, herkesekî a rast zû naskir. Vana bi xwe aşkartin (ispat) ku derewîn, keysbaz û neyar in:

Îro xwediyên serçavika van nerindiyana li bajarên Monîx (München), Beyrût û Berlîna Rojhilat veketine, em giliya ji kesên wek BEKO nakin ku bi wan hatin xapîn û em bawerin ku ev celeb kesana îro şermuzar in...

## **Çima Îro?**

Îro dîsa li Kurdistana Nîvro agirbaran e, ezmanê Kurdistan nizm bû ye, ewrên reş û tarî xwe berdane ser welêt û bi destên neyaran xîşma xwe dibarînin: Birçîbûn, nexweşî, girîn û kizîn û qîr e...

Îro, ew kesê ku li mala xwe rûne û bêdeng be, bê guman an qels e an jî neyar e. Her kesê ku xwe Kurd dinase divê di vê roja îro de li gor karîna xwe beşdarî vî şerê mirin û mayînê be. Bê merc û şirût, divê xwe bixe bin ala Şoreş û, tiştên jê werin xwestin, bê dudilî, bike.

Ev e bîr û baweriya me û jiber vê yekê em rapêçayî û şidandî xwe davêjin kada xebatê.

Ew zarokê ku di sala 1968 de ”diranên şîr” avêtin û bi paraztina Pêşmerge û kalê heftê salî, bû xortekî zana, çeleng û XWENAS: Di 11 avdar 1970 de xortê me dergîstî (destgirtî) bû û îro em di keftilefta anîna bûka rengîn de nin. Her berbû û xwendî sewê vê roja pîroz hespên xwe tîmar dikin û xwe dixemlînin... Hatina dengê def û diholan nêzîk e û ”mirina bi hevalan re (jî) dawet e”.

## **Hemreş Reşo**

*Çiya, (Reprint, 1974), r. VII-IX*

## Gotara Rojê

### H. Reşo

## Rêzaniya Netewî

Van du-sê salên bihorî bûn kada gellek bûyerên giran. Bengladeş bi alîkariya Hindistan xwe ji Pakistan rizgar kir. Di vî şerê azadî de Sovyêt bû hevalê Hindistan û Çîn jî bû ê Pakistana CENTO: Karbi-destên welatên Ereban ( Key, Şêx, Emîr, çep û şoreşvanên Flistînî) li dijî Îsraîl destên xwe dan hev, bi kêmfirotna ”Zêrê Reş” piştî dewlemendên Ewropa Rojava û Emerîka Bakur şikandin û dan erdê. Li Portekîz, zordestî hilweşiya, çep û rast di bin serektiya General Spínola de bûn yek û koloniyên xwe ên li Efrîka, Guinea Bissau û Mozambîk, dighên azadiya xwe. Wergerandina Makarios bi destê keleş Sampson Girava Qibris bû kada şer, leşkerên Tirk bi gengazî derketin giravê, di nav çend rojan de nivî wê xistin bin destên xwe, çep û rastên Tirkan bi yek dev û yek dest Ecevit bi Atatürk II navandin. Zordestiya leşkerî li Yunanistan hilweşiya û Karamanlîs bû karbidest!..

Gava em bala xwe berdidin van bûyerên renga-reng, em dibînin ku rêzaniyek netewî li cîhan teye ajotin. Raman, bîr û bawerî di demên waha, ên netewî de, zû li nav radibin û tîrên bîra kirin, kesên gel bi hev ve pê tîrên girêdan û şidandin, ji bo yek armanc, armanca parastina rûmeta gelê xwe dibin yek, dev ji pîvanên biçûk berdidin, gel û wela-tê xwe nakin goriyê bîr û baweriyên xwe, bi vacayî, xwe dibin goriyê gel û welat!

Gava em bi tenê rewşa Yunaniyên Qibris tînin ber çavên xwe, hêza yekitiyê bi hesanî tê dîtin û naskirin: Ta sala 1960 Qibris koloni yek Îngilîztan bû, sedî 82 yunanî û sedî 18 jî Tirk bûn. Girava Qibris bi keftileft û xwûna Yunaniyan ji Înglîz hate rizgarkirin û bû Komareke

serbixwe. Tirk bi fêlbaziyên Înglîz jî ”bûn xwediyê lawikê hazir” û sedî 36 maf standin! Lê di hundirê Turkiyê de sedî hîç (0) mafên Kurdan nehate naskirin û Kurd bi ”Tirkên Çiyayî” hatibûn navandin, a giringtir ew e ku kesekî li cîhan ev zînata Tirkan neda ser lêv û zimanê xwe. Îro, jiber ku gelê Yunanî ne li serhev e û hevdin dikujin, nikarin û nikarîn pêşiya derketina leşkerên Tirk bigrin. Tirka bi destezorî nivê giravê xistin bin destên xwe û navê vî şerê bêmaf jî kirin ”Hereketa Aşîf”!

## **Jêder**

Ev sedsala bîstan a xwenasî û serxwebûna gelan e. Her gel û wela-tekî du rêzanî dane ber xwe, a hundir û a derve. Li hember derve, serxwebûna gel a netewî û aborî, sînorî welêt û yekitiya gel tê parastin. Di hundir de, ji bo bilindkirina jîna gel, bîr û baweriyên renga-reng li hember hev radibin. Jiber ku sînorekî me ê xweser tunebû û em di bin nîrekî hov de bûn, xwenasiya gelê me bi livînek pir sist û giran pêşve diçû, di destpêka Şoreşa Nîvro sala 1961 ta 1970 gellekî mixabin ku rêzaniya me dûrî van herdu destûrên jor bû. 60 000 Kurdên çekdar, tev leşkerê iraqî, di bin navê ”Siwarên Sela-heddîn”de li dijî Pêşmerge şer dikirin, lê îro em dibînin ku hejmarawan sedî 82 kêmbûye, ango daketiye 5000 ran. Îro ev 5 000 Kurd tev 90 000 leşkerê iraqî bi çekên nûderketî(modern), balafir û tankên Sowyetî êrişine bêbav dibin ser gund û bajarên Kurdistana Nîvro, xişma xwe a salan ku nikarîn hêza Pêşmerge bişkênînin, bi agirê napalm, gulleyên top û tankan, di ser zar û mindal, pîr û kalan de dirêjînin!

Ev 13 sal in ku va hovitiya karbidestên iraqî, di demên aşîf de jî, domdar e, dîsa hîç kesek berê xwe nade me û destê alîkarî dirêjî me nake. Ma gelo çavên van nabînin? Evana lal bûn e an jî guhên van nabihîzin?.. Belê, evana dibihîzin, dibînin û zanin jî! Lê naxwaz in. Çima? bi kurtî, karê wan di vê de he ye. Wan divê rojhilata navîn her

li hevketî bimîne û Kurd her şer bikin, lê sernekevin. Ewana dixwazin bi tenê ”garisê xwe di berre birêwisînin”. Ma ji bo çi Kurdistan kirin çar parçan? Ger aşitî û bêdengî serkeve, balafir, tank, ..., û çekên wan kî bikire?..

Niha ev rastiya giştê nîkarin werin veşartin û têne naskirin. Me li jor got ku hêjmara Caşan kêr bû ye, di nav van sêzdeh salan de hişyarî û xwenasî, di nav gelê Kurd de, gellek gavên mezin avêtin û vê jî fêl û pîlangeriya neyaran di bin de hilweşand.

Herçend ku niha hin celeb kes li nav me Kurdan dertên, bi çek an bi pênuş, bi ziman an bi axaftin, li dijî Şoreşê radibin û bi zimandirêjîya ”raman” an ”bîr û bawerî” dixwazin rûçikên xwe ên genî û kirêt veşêrin jî, xwefiroşî û xinizîya wan li ser rûyê wan tê xwendin.

Belê, di vê demê de hespa rêzaniya netewî pirr bezo ye, ma çi dibê gava em jî hinekî hespa xwe bibezînin, ji bo parastina rûmeta gelê Kurd car-caran guh û çavên xwe bigrin?! ”Gava çûyî welatekî ku pîraniya wan kor in, tu jî, bi kêmanî, çavekî xwe bigre”! Ev pîrsa pêşîyan bi belaşî nehatiye gotin.

Bê guman, divê keftilefta raman, bîr û bawerî were kirin û domdar be. Ev mercên pêşveçûnê nin, lê ciyê kesên ramangîr û têkoşer her li nik gel in, ne bi vacayî!

*Çiya, (Reprint, 1974), r. VII-IX*

## **Kuncikê Henekan**

### **Ger Kurd Nebûya...**

Di demên kevn de Kurdek bûye muftiyê Bexdadê, lê Ereb bi vê yeka nan pir dilteng bûne û her roj li hember mala wî bi tîpên mezin ev gotinên han nivisîne,

”Ger Kurd nebûyana, barên keran ê girantir bibûna.”

Ereban bi vê diltergiya xwe dinimandin.

Gava muftî dertê avdesta sibê, vê dibîne û destra misîne xwe li wir datîne, pê nûsa xwe digre û diçe. Ew jî li bin wê gotina wana waha dinivisîne,

”Raste, ger Kurd nebûyana barê Ereban ê hêj girantir bibûya.”

*Çiya, Hejmar 1, r. 6*

## **Di mabêna...**

Rojek li rojan, paşayê Osmanî waliyekî Ereba dişîne Bexdadê. Şênîyê bajêr û muftî jî diçin xêrhatina wî bikin. Ereber, ku hatine, pişt li erebtîya walî digrin, gilî û gazinên xwe pêşkeşî walî dikin. Giliyên wan ên pir, derew û li Kurdan bûn.

Muftî jî tev walî li ser nivînekê li nîk hev rûniştî û pal dabûr. balgiyekî.

Li ser wan gilî, gazin û derewên Ereban, walî pir bêhteng dibe û vedigere ser muftî û dibêje,

”Gelo muftiyê fendî, bi rastî di mabera Ker û Kurd de çî he ye?”

Muftî gelekî bi nermî dibêje,

”Waliyê fendî, Xwedê emrê te dirêj bike, bi rastî di mabêna Ker û Kurd de tişteki pir biçûk he ye ku ew jî balgî ye!”

*Çiya, Hejmar 1, r. 6*



## Quncikê Helbestan

### Kovara Çiya Reşo

Her wekî bi dirav  
Ne biha û giran î  
Lê bi çand û nav  
Tu pirşing û baran î.

Têkevî nav Kurmancan  
Bi telbîz û xinavî  
Şûvên kiraw, bej û can  
Wek çeman bikî avî.

Nola pêlweş û demdar  
Deng bidî şax û banî  
Bibî benê peyîvdar  
Lalitî nav me rakî.

Dê wek navê xwe ”Çiya”  
Sergevaz û bilind bî  
Şên bikî malbata xwe  
Bi zaravayê kurmancî.

*Çiya, Hejmar 1, r. 6*

## Xevneroj

Min, belê min!  
Serê xwe danî,  
demjimar dinalî.  
Ez xewar;  
Lê ma bûm payî.  
Guhdarî dikir  
Ji benê peyîvdar,  
Stranên zar...  
Dile,  
Dixwaze ha!  
Li min bû bar,  
Ez kirim Serdar!...  
Min ji xwe re got:  
Qey nake,  
Dibe ha  
Şeytan e,  
A Xwedê nake,  
Şa dike min...  
Serê min, ê avis?  
Nişkava za...  
Zarok ka?!  
Ode tijî ronak bû,  
Şêqîn kete ewran.  
Herçar hêl lertzand,  
Ez hîn di xew de!...  
Min,  
Serê xwe rakir,  
Bal da.

Terşek ber pencerê  
Li min dinêrê,  
Ez li Ewropa,  
Zarok li derva!...  
Serê xwe leqand,  
Wek dîlberek dîldar.  
Ez rabûm,  
Ew diçe  
Min da dûv,  
Mîna kehribar  
Min dikşîne...  
Naxwazim biçim (!)  
Lê Ew  
Bala xwe  
Berdide min,  
Bêheş dike  
Digre mêjyê min.  
Bê dilsozî(!)  
Dûv ketim,  
Lê gavên terş  
Hiç nabînim!!  
Sîngekî fireh,  
Tev du henar.  
Bejneke zirav  
Û tijî naz!  
Wek teyrê Baz...  
Hembêze xwe vekir,  
Pisîra xwe derkir.  
Min dît:  
Avek zor, him gulsor  
Dihêrikî wek kanî,  
Dorhêl hemu mor!...

Dîlbera bedew,  
Ew sîngê gewr  
Birîndar bû...  
Min çend gav avêtin,  
Bervê çûm.  
Ew:  
Girvebû,  
Bi dilgermî  
Destên min  
Girt bi nermî!..  
Ew çavên pirşingî,  
Tarî bûn,  
Vemiryan,  
Girtin xunavî:  
Dilop dikirin,  
Wek sîvnegên berfbarî.  
Min:  
Bala xwe dayê,  
Rind bal kir.  
Ricifk ket dil,  
Lerzî laşê min...  
Min naskir:  
!!  
Evîna xwe,  
Nizam a çend salî!  
Ketim ser çongan,  
Devê xwe,  
Çavên xwe,  
Bi lingan dan.  
Ji şerm û fihêt,  
Bê rabûn,  
Dakoo!...

Tu yîî?...

Bibore min rûreşî

Ez pîr ketim derengî...

Destên min berda.

Porê min mistda...

(Min jê pirsî)

– Dakê ev çi xwûn e?

– ”Xwûna Nîvro ye!”

– Lê ev birîn û rûyê mat?

– ”Ji Bakur û Rojhilat!”

– Çima evqas sinixî?

– ”Bi lawên min girtiye

Xinizî û kambaxî!”

.....

Bi qîra Rustemê Zal,

Tev şal,

Tév xûya sar,

Berda pal,

Derketim ji mal!

Wek miriyê hezar salî

Xof bûm,

Rabûm,

Li xevna roj;

Berda serdarî

Min girt xulamî.

Bang kir,

Tiliya xwe rakir:

”Rabe bavê kal,

Kurdistan bi çi halî!”

*Çiya, Hejmar 1, r. 7-8*

## Metelokên Kurdî

- 1- Çiya çiqas bilin be, rê pê dikeve.
- 2- Giya çiqasî nerm e jî, di bin keviran de hêşin dibe.
- 3- Salê ducaran cêjn dibin, di wan rojan de jî zikê sêwîyan dêşe.
- 4- Dilê tirsok sîngê Gewrê nabîne.
- 5- Ger kurmê darê ne ji dêr be, dar narize.
- 6- Dem bi dor e, hergav li ber derê yekî disekine.
- 7- Gava ruvî şil bû, ji baranê natirse.

*Çiya, Hejmar 1, r. 8*

## Gotara Rojê Reşo

### Biratî

Ez bawer dikim û dizanim ku gava xwendevanên me vê sernavka jor "Biratî" bibînin, ê bikenin û ji hevdin re bêjine "Ma gelo Reşo tiştekî din nedît ku binivîse, çû çû ev dît? Ma em nizanin ku "biratî" çi ye?".. Lê ez nihada we pîroz dikim, lêborîna xwe ji we hêvî dikim û dixwazim. Rast e her kesên ku xwe Kurd dizanin, an jî xwûna Kurdan tê de dilfêze, pir çak dizanin ku "biratî" çi ye. Lê belê gava ku min xwest vê gotarê pêşkeşî wa xwendevanên delal û Hêja bikim, daxwaza min ew bû ku ez bidim ber çavên we, ên ku ji min xweştir "biratîyê" dizanin, bizanibin ka cîran û kolîdarên me vê gotinê bi avayî kartûnî û çawan tê dighên. Rast e kesên ku me nasdikin jî rind dizanin ku Kurd ne bi tenê "biratîyê" dizanin, ew Kurdên dilpaqij dizanin ku "bi şev jî bi başvalayî li ser xaniyên cîran û kirîvên xwe re çûyî" ne mercên merovtî û mêraniyê ne.

Hemû kes, tev neyar û kolîdarên me jî, dizanin ku em Kurd in û welatê me jî hatiye parvekirin. Dîsan ewna ji me çaktir dizanin ku welatê me dewlemend e û ji wan re jî kormeke zêrînî ye. Belê ewna seh dikin, bawer dikin û rind jî dizanin ku çi gav û demê de be emê dawî li ser welatê xwe aza, serxwe û serbilind bijîn... Her wekî ku rewş ev e jî zînatkar û zorker giringiya demê dizanê û dev ji kormê bernadê. Her û her dixwazê bi fêlbazî kormê biçerpînê û kêra xwe di sifrê de cik bikê. Bona dem dirêjkirinê jî pir rê dane ber xwe:

1-Hewldan ji bo helandin û wenda kirina gelê Kurd di nava gelê xwe de.

2-Xistina dubendî û nerindî nava gel û berdanheva wan.

3-Bi pêkanîna hevaltî û saziyek alîkarî di nava cîran û parbirayên xwe ên biyanî de.

4-Kirina doza biratî, di bin perda Oletî de...

### **Helandin û wenda kirin**

Çawa gel tê helandin û wenda kirin? Neyarên me reyên pir hêsan (!) dane ber xwe ku ewna jî ev in:

a) Bîrbirina zimanê dê û bavê, ango ê zikmakî. Ev jî bi darê zorê qedexekirina axaftin, nivisîn, peyvîn û xwendina wî zimanî û hînkirindana zimanê xwe bi kesên gel, an jî tiştêkî biçûk mezin kirin û di bin navê Rabûnê de leşkerên xwe şandin ji bo kuştin, çavtirsandin û qelandina gel.

b) Tunebûna çand û dîrok rastgerandin. Neyarên me bi reya zaneyên (!) xwe û bi devên pêûsfiroşan tunebûna çand û dîroka me bi avakî welê pêşkeşî me dikin ku merov pê bawer bike û xwe ji kesek ji gelê wan zanibe. Dîsan bi derew û fêlbazî pesn didin me û dibêjin: "Hûn kesên ku li ser çiyayê ji gelê ta niha paqij manin!"

c) Tevî van kirinên xwe hêj kêsa xwe pê nînin û rê nadin zane û hozanan ku li çand û dîroka me hûr binêrin. Ger hinek zaneyên biyanî vî karî bikin, neyar reya pirper û nivîsarên wan digrin ku di nava gelê me de belav nebe, an jî pêûsa wan dikirin ku rastiyê nenivîsîn.

### **Nerindî û dubenditî**

Neyar çawa nerindî û dubendiyê dixwe nava gel û wan berdide hev? Berî her tiştî bi navê axa, şêx û mîritiyê kesên gel ji hev vediqetînin û car bi car piştmeîriya hinekan ji wan dikin û berdidin hev. Gava ku di vî warî de serketin, vê carê dev davêjin belengazan. Jiber ku jimara serek û dewlemendan kêm in û zanin ku çi demê de be ê bikaribin wan bigrin û berbend bikin, piştmeîriya wan dikin û bi destên wan,



belengazan dêşînin û pfs dikin. Bi vê rê jî belengazan dikin dujminê serék û dewlemendên welêt ku rojekê ew kesana nikaribin li hember kolîdaran tevî peyayên xwe rabin. Gava ku di vî warî de jî serdikevin û belengaz û pêşengên wan dikin dujminê hev, vê carê vedigerin. ser ên dewlemend û bi reya girtêgeh, zîndan, goçer kirin û berdana wan belen.gazan, çavên wan ditirsînin. Rewşek welê pêktînin ku nema baweriya kesên gel bi hev din dimîne û nema yekitî di nava wan de ji bo demek dirêj pêk tê..

### **Pêkanîna hevaltî û saziyek alîkarî**

Neyarên me, ew parbirayên kolîdar, herdem li vîn û hêzên netewî ditirsin. Jiber vê yêkê saziyek an rêxistinek hevaltî û alîkarî di nava xwe de pêk tînin (wek CENTO) û xwe ji bo rojên pêşta ku ê bên, pêk tînin ku paşê bikaribin çav û devên azadîxwazên cîhanê bigrin û bêjim ”Ev tiştekî hundirî ye û me berê jî ev saziya pêk anî ye. Ev mafê me ye ku em alîkariya hev bikin û bédengiyê têxin nava welatê xwe!” Bi vî tunî, gava ku azadîxwazên gelêr bixwazin rabin, li hember xwe hêzên hemû neyarên xwe dibînin û qels dibin.

### **Di bin navê Ol de**

A kirêt û pîstir ew e ku ew neyarên bêbav bê dilovanî di bin perdeyek ne-rast de doza biratiyê dikin. Gava em çavên xwe berdidin Nîvro û K.Navîn, em dibînin ku kolîdarên me Ereba dibêjin: ”Hûn Kurd in, em Ereba in. Lê em hemû bisilman in û Ereba jî!” Li Bakur, Tirk dibêjin ”em hemû bisilman in (tew navê Kurd nadin devê xwe) û bira nin, tev de jî Tirk in. Li Rojhilat Fars jî her waha!.. Lê nizamim gelo ma tê bîra wan ku bi vî tunî, bi biratiya bisilmanî Tirk, Fars û Ereba jî dibine ”bira”? Ma gelo çima ewana nabine yêk? Wekî din sêzdeh dewletên Ereba henin, hemû jî Ereba û bisilman in, bo çî ta niha wana nikarî bi yêk welat bin?.. Paşê gava ku taw kete Ereba, di şerê cîhanî ê yêkan de, çima Ereba guhpêl xwe ji Tirkan qetandin, tev ketxuran şerê Osmaniyan kirin? Her wekî ku wê demê de Xelîfê

jî di destê Tirkan de bû, bo çî wan "biratiya bisilmanî" ji bîra xwe birin û tev ên ne bisilman li dijî Tirkan şer kirin û ewna kuştin û li welatê xwe derkirin? Jiber ku ew "birayên bisilman" malxurê wan bûn û-xwûna wan dimêtin!..

Xwendevanên delal, hûn jî dizanin ku "biratî" ji bo herdu aliyan e, bi tenê ji aliyekî "biratî" tê ye xwestin û di bi vê perdeya teres de hemû mafên merovtî û ên ku Xwedê dayî ji aliyekî têne standin. Ev "biratiya" waha xapandin, bê sinçitî û hovitî ye!..

Werin ne, yarên guhpêl, fêlbaz û zorker! Werin em carekê ji hev rûnin û çêla "biratiya" rastane bikin. Ka ta niha çî "biratî" we ji me re kiriye. Bi tenê wek yek kiriye, belê tenê , yek! Ku em pir sipas dikin. Ew jî hûn pir û bêtir ji reya rast derketin û we dilpaqijîya me bi zora çî rakir û bi lêxistina serên me, WE em hişyar û belengaz kirin ku nema em ji vê pîştir rewşeke jînê dibînin û lewre jî êdî ne tiştêkî me yî ku em ji destçûyîna wî bitirsin heye û ne jî em bi We êdî bawer dikin. Bapîrên me gotine: "GAVA Rûvî şil bû ji BARANê natirse û dilê TÎRSOK jî sîngê gewrê nabîne."

*Çiya, Hejmar 1, r. 9-10*

# Bajarên Kurdistan

## DÛYARBEKÏR

HAYAT

Ansîklopediya Turkiyê

Wergervan: Reşo

Ciyê wî: Diyarbekir li rojhilat bi Sîirt, nîvro Mardîn û Urfa, rojava Adiyaman û Malatya, bakur Elazix û Bîngol, û bakurrojhilat bi bajarê Muşê dorhêla xwe hatiye girêdan. Mezintî û firebûna erdê wî di nava van sînoran de 15 354 km<sup>2</sup> ye.

Erdê bajêr di kurtê de ye û dorhêla xwe jî bi çiyayên bilind hatiye girêdan. Ciyê bajêr 650 m li avşînê (dengiz) bilindtir e. Çiyayên Toros ên nîvrorojhilat, bakurê bajêr wek kivanekî digrin. Ev çiyana Diyarbekirê jî bajarên Malatya, Elazix û Bîngolê vediqetînin. Li nîvro xwe dighînin sirtê Mardînê û li rojava bi çiyayê Qerecedax, xwe li. Urfa vediqetîne. Qerecedax volkanekî vemirî ye û bilindiya xwe 1919 m ye. Qerecedax bi kevirên bazalt, bona avahî (qunax û xanî) û bi ava xwe jî jibo rûniştvanên dorhêlê havilê xwe dide. Jiber kevirên bazalt xaniyên wanderan hemû reş in.

Li gor hêjmartina sala 1960 an, rûniştvanên bajêr, tev qeza, nahiye û gundan 401 770 kes in. Serî km<sup>2</sup> 27 kes lêdikeve. 1/5 rûniştvan di bajêr de dijîn û hêjmara wan 80 645 kesin. Diyarbekir bi girbûnê di nava bajarên Turkiyê de ciyê 14 digre. Dorhêla bajarê kevn bi bedenan (sûr) hatiye hûnandin û çar deriyên xwe henin. Li bakur, deriyê Xarpitê an "deriyê Çiya", li rojava deriyê Urfa, li nîvro, deriyê Mardînê, li rojhilat, deriyê Nû an "Deriyê Dicle". Li derî bedenan bajerekî modern hatiye ava kirin. Di bajêr de kargehên lastîk, şayak, qeş (cemed) û çeltûkê (pirinc, riz) henin.

*Dûmahîk heye.*

*Çiya, Hejmar 1, r. 11-12*

Quncikê Dîrok  
Nivîskar: Burchard Brenjes  
Wergervan: H. Reşo

*Kovara zanistî a Zanîngeha Martin Luther li Halle-Wittenberg ji rêza zanistiya civakî û zimannasî. Sala 8 tan 1964, hêjmar 9/10, Rûpel ji 679-694an.*

## **Di Derbara Hin Kêşeyên Dîroka Têkoşîna Kurd ên Netewî**

Lêhûrnêrîna dîroka saziyên siyasî ên veşartî, ku di têkoşînê de nin, pir dijwar e. Jiber ku ewna bi tenê tiştên ku ji bo xebata xwe havildar dizanin, belav û eşkere dikin.(1)

PDK (Partî Demokratî Kurdistan li Îraq) jî ji van navê veqetandin, lê di xebata wê de gelek kelemên dijwar xwe didin pêş. Ewa nêwertiya têkoşîna netewî a gelekî dike ku ji bextreşîya xwe di dongiya Şerê Cîhanî a yekan a împeryalistî de bi kişandina sînoren nû li Rojhilata Navîn, di nav çar dûgelande hate parve kirin û di nav wan de kete rewşa hindikiyan (eqaliyet). Herwekî tew nebe gelên din ên rojhilata navîn wek Gurcî, Ermenî, Azerî, Tirk, Fars û Ereban karîn parçek ji gelên xwe bighînin serxwebûnê; gelê Kurd bi vacayî li herderekê bûn hindikî û ji gişt mafên netewî bêpar man. Bi tenê herdu komikên ku li Komarên Sovyetistanê ên Kafkas û rojhilata navîn gîhan mafên xwe. Lê ewana jî bi 200 000 kes nikarin bighên 1/60 ji rûniştvanîya gelê xwe. Ewana ji leşkerên Kurd ên ku Tirk û Farisan berê şandibûn ser sînor mane.(2) Jiber vê yekê merov nikare bi van bibêje ku kêşeya mafên netewî ên Kurd hatiye verişandin.

Rewşa hindikî ya Kurdan ciyekî pir qels di Têkoşîna wan gelên

serdest li dijî imperyalîzim dida ber çavan. Jiber ku gelê Kurd berî gişan barê hişyariya neteweperestiya burjuwajî a Ereb, Tirk û Farisan dikşand.

Ev serpêhatî cara yekan di şoreşa "Tirkên Xort" de, sala 1908/1909 de hate kirin û eva piştî 14.7.58 de li Îraq jî hate dîtin.

Piraniya Kurdan di nav sînorên Turkiya îro de nin, a rast, divê merov vî cî wek Kurdistana Bakur û Rojava binavî ne. Li gor Tirkan, 2,5 mîlyon û Kurdan ducarî bêtir Kurd li vir (Rojhilat) dijîn.(3)

Ji Avşîna Reş ta rojhilatê bakurê Iraq, ji Dema Navîn (orta çağ) ta sedsalên bihorî, pir dewlêtên Kurd ên biçûk karîn xwe biparêzin. Di navbera salên 1837 û 1852 de, piştî hêzbûna "Bab'î Aalî", osmaniya zordarî li dewlêtên Kurdan BOHTAN, HAKKARÎ, BADÎNAN, SORAN û BABAN kirin.(4) Di vê demê de Farsa jî malbatên MUKRI û ARDELAN xistin bin destên xwe.

Herçend ku Bîranîna kirinên Selahadînî Eyubî li welatê wî Erbîl zîndetiya xwe veşartîye jî, dewlêtên kevn êdî bûn dîrok û di nav rûpelên wê de hatin veşartin.(5)

Împaratoriya Şahrezor di sedsalên 11-16 li Yasin Tepe (Girê Yezidiya) û Dewleta Merwaniyan li Diyarbekir (Amed) di sedsala 11 de giring bûn.(6)

Li Rojhilata Turkiyê û li Bakurî Iraq têkoşîna Kurd a netewî pêşve çû.(7)

Merov dikare têkoşînên Kurd ên netewî bike çar biran.

1. Têkoşîna çend serek eşîran bo serxwebûn li dijî Tirk an Farisan û afirîna hişyariya netewî.
2. Dema pêkanîna rêxistinên siyasî (rêzanî), di dema berî şerê (leca) Cîhanî a Yekan (1880-1914).
3. Têkoşîna Serxwebûn û pêkhatina Yekitiya giştî Kurdan, di navbera

herdu Şerên Cihanî de (1918-1939)

4. Piştî bi hêzbûna têkoşîna antifaşîstî û antîkolonyalîst di cîhan de, pêkhatina Saziyên (partî) demokratî û antiîmperyalîst.

### **Nivîsek li bin xerîtaya Kurdistan:**

***Kurdistan: Ciyê xetxetî, li gor têkoşerên Kurd e. A di nav de jî li gor Eagletons e, binêre "The Kurdish Republik of 1946".***

*Dûmahîk di hêjmarên tê de.*

### **Têbinî**

(1) Pir caran tiştên zikmakî (orijinal) bi dest nakevin û hinekan jî merov li gor demê nikare belav bike. Gelek caran gotin û peyvên herdu aliyan an jî belavkirinên weşanên (pêlweş, pirtûk, kovar, rojname, belavok, h.p.) wan dibin çavik. Jiber vê yekê emê paşê navên çend kovar û rojnameyên kurdî ên giring binivîsin. Binêrin li Mêjoy Edebi Kurdî, Ala'uddin Sadjadi, Bexdad 1952, rûpel 551 wirde û Salahaddin M. Saadallah, Kurdisten we l-Harakat elwataniye l-kurdiye, Bexdad 1959.

(2) Wiltschweski, O., Kurden, Moskau-Leningrad 1961.

(3) Kurdistan auf dem Weg zur Freiheit (Kurdistan li ser reya Azadî). Komîteya Paraztina Mafê Gelê Kurd. Tebax (agust) 1962, rû. 2

(4) Edmonds, J. C., Kurds, Turks and Arabs. London 1957, rû.8

(5) Minorski, V., Studies in Caucasian History. London 1953, rû. 116 û wirde.

(6) Archiv der Gegenwart, Folge 38, 16.9.-21.9.1962, rûpel 10-105 A.

(7) Kurdo Agir binêre, Kurdistan ath Tha'ira, 1963 (manuskript).

*Çiya, Hejmar 1, r. 12-13*

## Gotara Rojê Reşo

### Dilsozên Welêt

Ev bû salek ku dîsan wek salên bihorî karbidestên Iraq, ên zorker, ala hovitî û rovitiyê, li dijî gelê me ê azadîxwaz, hildane. Bi hemû hêzên xwe êrişî gelê me ê leheng û çilekêş dikine. Bombeyên jahr û napalm, ku li gor biryarên Rêxistina Yekiya Gelan (UNO) qedexenin, di ser gundên tijî kal û pîr, jin û zarokan de dibarînin. Ta niha hîç dewletek an saziyek navkirî, ên azadîxwaz, nema ye ku ev kirinên zorkeran protesto nekirine. Her waha Rêxistinên Alîkarîvan wek Xaça Sor çend caran daxwaza alîkariya êşbir û xwarin ji bo gelê Kurd şande karbidestên Iraq ên zorker re. Ev hêmû daxwaz û nameyên van xêrxwaz û camêran bê bersîv man!

Li aliyê din em werin ser rewşa şoreşvanên welêt li Kurdistana Iraq: Her çiqas ku rojname û pêlweşên neyaran bi derew û fêbazî her roj çêla şoreş bi neqencî dikin û propagandek kûr li dijî Pêşmergeyê leheng belav dikin jî, ji aliyê din rojname, pêlweş û wêneguhazên welatên biyanî rastiya rewşa welêt bi her reng û tunî didin ber çavên gelên cîhanê... Bi reya girêdana saziyên niştimanî ên derveyî welêt û nêwerên Şoriş li Ewropa jî em dizanin ku îro rewşa Şoriş li Kurdistana Iraq ji çar salên bihorî gelekî çaktir e. Her tun çekên paraztin û êrişî ketine destên Pêşmerge û hêjmara wan zêdetir û zanîna xwe bêtir bûye. Divê em tucaran nînin bîra xwe ku êdî neyar bikaribin vê carê me bidine erdê. Serketin, serdestiya Şoreş û azadiya parçe welat êdî seda sed xûya ye. Ger dijminê me bixwaze, an nexwaze, hevalên Kurd ê bi her tunî alîkariya me bikin û ger bin erdê re be jî, ê xwe bighînin me...

Belê xwendevanên gelperest, her çiqas rewşa dijmin û a şoreşvanan

ev e jî, ev bû salik ku dilsariyek ketiye nava me xortên derveyî welêt, ên ku ji hemû dîtînên nêzîk dûr in. Ev dilsariya han her wekî ku bi xebata çend kesên berpîrsî, yar û pêşeng dûrdikevê jî dîsan hin kes henin ku destên xwe ji keysbazî û nerindiyê bernedane. Ev kesana di nav her du aliyan de jî henin û zerarek mezin gihandine xebata me a Ewropa û em kirine du şîpan. Ên di nav Saziya (PDK) xoşewîst de doza welêt ji bîr birine, ciyê ku armancên Saziyê ji xwe re bikin raman û saziya xwe di nava armanc û doza wê de bibînin; armanc û doza xwe di saziyê de dibînine!... Herçend ku berpîrsiyarên Saziyê ev rastiya han di civakan de dane ber çavan jî, hinek endam bi kûrîfî ji lingên Saziya xwe dêxine û wê her roj qelstir dikine. Bi hêla dinve kesên ku van rêşaşên waha dîtine, kirinên wan dikine malê Saziyê û gunehên wan dêxine stuyê wê rêxistina şoreşgîr û xoşewîst.

Ez wek birayekî dengê xwe bilind dikim û bi dilê xwe ê birîn bang dikim: Birayên delal, hêvî dikim çavên xwe vekin, rewşa Şoreş bidin ber çavên xwe: Xwûna Pêşmergeyên leheng ku her roj ji bo azadiya we dihêrike û dirije bîr mebin. Xûçk û bira, bav û dayikên ku di bin agirê top, balafir û tankan de her roj bi dehan şehîd dibin, mekin goriyê ramanên xwe ên rêzanî (siyasî)! Ramana her çi be, ji xwe re bihêlin û xwe ji hemû rik, keysbazî û ezperestiyê bifiltînin û biparêzingda ku em hemû yekdest, yekdoz bi tenê xebat ji bona serketina Şoreşa delal bikin û bi piştmerên Pêşmergeyên leheng (qehreman) bin. Îro roj divê em tenê doza azadkirina erdê welêt bikin, da ku ciyê sifreya xwarin û vexwarinê bi dest xwe xin. Gava me sifre danî, dêmen an jî tunê wê hûn dikarin bi serbilindî pêşkeş û doza ramanên xwe bikin. Belê divê em jîneke xweştir ji bona gelê xwe bînin, lê li kuder û emê li ser çi bijîn? Ma gelo bindestiya neyaran ji kurdekî nezan an dîktator xweştir e?!.. Wênavan (resam) berî her tiştî wêneyan bi pênûsên (qelem) reş çê dike û dawî li gor desthatin û zanîna xwe reng û rdtîşan dide wan! Divê berî her tiştî em xwe ji valahî bifiltînin! Divê lingên me carekê cî bigrin!..



Ey bêvacê teb'ê xewar  
Te şerbeta jahrê vexwar,  
Te ne got tirş û ne jî tal  
De bes e vemexe, bêvacê minî teb'ê xewar!

*Çiya, Hejmar 2, r. 3-4*

## Welat

Min bibore ez gorî, bi pirs têma Te  
Hêvî dikim Tu bidî min bersîv welat.  
Ev rexne û pêşneyar gişt digrim ji Te  
Têbighê û bigre, Tu li minke xelat.

Doş bûm, geriyam, hatim li welatên din,  
Min nedît, tayê dêmen û rindiya Te.  
Dewlemend, bilind û xweştir î ji ên din,  
Lê belê, ez kuştim, vê xwûnsariya Te.

Bi hezaran sal in, ku em in li ser Te  
Dijîne nola KEW, Te pêşkeş dikiñ  
Ji neyar, xwûnmêj û zorkerên xwe re Te.  
Tu hîn xwûnsar, bédeng û dilsarîñ î?!

Ez dipirsim ji Te, welatê şîrin  
Ê çi gavê bilîze ew xwûna gelêr  
Ku biçirîñî, vekî sîngê bi birîn  
Da Tu bidî, ber çavên noker û neyêr!

Tika ye, veqelêş, daqiltîn neyaran  
Da ku hemû zanbin ”Dew birê mêst e”  
Bila em jî wenda bin, bimrin teve wan  
Ber ku em bûn e ”BIZDOK”, ev tev de rast e!

**Reşo- Berlin, roja**

**24.9.1965**

*Çiya, Hejmar 2, r. 5*

## **Quncikê Dîrok Dûmahîka hêjmar-1**

### **I. Pêkhatina Xwenasîna Netewî a Kurdî**

Di sedsala 8.de rêçên pêşî ên kurdayetî, di aliyê wêje (edeb) de, tèn dîtîn. Baberaxî Hamezanî çêla girtin û ser û bin kirina Îranê bi destên îslaman û li dijî wan rawestîna gelê xwe dike (8). Vejandin û pêşvebirina zimanê kurdî bi destên Baba Tahir Hamadanî û Elî Termokî di sedsala 10.de destpê dike(9). Di sedsala 11.de ên pêşî ku dengê xwe li dijî zînata rêzanî, a li ser gelê xwe bilind kirin Elî Herîrî Şemdînî (1009-1079) û 300 sal piştî wî Feqiyê Teyran (1302-1375) bû (10). Di sedsala 15.de jî şêxê sofîyan Ehmed Nîsanî (1407-1481) û Mela Ehmed Batê navdar in. Ji bo dîrokvanên vê demê, Şeref Name ya (1596) Şeref Xanê Bîtlîsî hin çavikek giring e. (11).

Nemaze bi Ehmedê Xanî Hakkarî (1650-1700), di dema dewletên kurdî yê biçûk ên sedsala 17.de lîrika kurdî gîha bilindayiya xwe. Avahiya wî Mem û Zîn Kurdistana zincîrkirî tîne ber çavan û gazî têkoşîna azadî dike (12).

Têkoşîna rêzanî a destpêka sedsala 19. bi dijberiya Tirk û Rusan ve pêt hatibû girêdan. Her qelsbûn an girêdanek Tirkêr zordar dibû keysek tevgera azadî bi alîkariya Rusan. Her hêzbûnek wan jî bi vacayî neya êrişên wan ser Kurdistana vedikir. Di sala 1804/05 dagirtina Rusan li ser Turkiyê giran bû û di sala 1806 de jî li Sulêmanî Ebdurehman Paşa Baban serê xwe rakir.(13)

Eşîrên li Îran jî her keysek pîşk dikirin û dest bi rabûna çekdarî dikirin. Di sala 1818 de eşîrên Bîlbas serê xwe rakirin, lê serneketin; sala 1820 ta 1822 yan dîsa şerê azadî kirin û ev şerana bi ketin û rabûn ta sala 1825 dom kirin.(14)

Di dema şerê Rus û Tirk (1828-1829) de Bahlûl Paşa alîkariya Rusan û Emîr Paşayê Muşî alîkariya Tirkan xwest. Di dema şerê Misrî û Tirkan (1832-1839) Mîr Mohammed Rewandîzî, ji bo avêtina Tirkên kû bi hezaran Kurd kuştin û darxistin, dest avêt çekan. (15) Di sala 1839 de Mahmud Paşa li Sulêmaniyê li hember Tirkan rabû û dest avêt çekan.

Hewldana Bedirxan Beg ji bo danîna dewletekî (1843-1846) pir girîng e. Emîrê Dergulî li navçeyên Wan, Urmiye, Diyarbekir, Saçbulaq (Mahabat) û li Musulê xwediyê navekî mezin bû. Bi telvêbûna serekeşîrên mezin wek Kor Husên Begê Qersî ji bo wî (Bedirxan) leşkerekî mezin hate ser hev ku karîn bi mêranî li hember Tirkan rawestin.

Hewldana Bedirxan ku ne bi tenê serekdewletekî olêr be, ser de jî ji şênîyê ne îslam bêtir bêşê bistîne, bû ûştta serhildana Asuriyan, nema-ze ên li Hekkarî ku pirên wan hatin kuştin. Serhildana van dewleta kurdî pir qels kir û Bedirxan di sala 1847 de kete destên Tirkan. Ewa avêtin Kreta. (16)

Piştî şeş salan Îzeddîn Şerî Hekkarî û Botan êşîrên Wanê ta Musulê civandin ser hev û dest bi şoreş kir. Bîranîna şoreşa wî a du salan hîn di stranên gelêr de xwe diparêzin.

*Dûmahîk di hêjmara tede.*

(8) Minorski, V., Les.Kurdes; Joyce Blau, Le Probleme kurde, di: Le Monde Musulman contemporain. Paris 1963, rûpel 15.

(9) Binêre Al-Machriq, Beirut 1955, rûp.201-239.

(10) Joyce Blau, wek li jor, rûp. 16.

(11) Cheref-Ouddine (Şerefxan), Cheref Nameh (Şeref Name), ou Fastes de la Nation Kourde, Wergervan: B. Charmoy, St. Petersburg, 1868 ta 1875.

- (12) B. Nikitine, Les Kurdes, Paris 1956, rûp. 179.
- (13) Rich, J., Narrative of a residence in Kurdistan. London 1836, dîwan I, rûp. 384
- (14) B. Nikitine, wek a jor., rûp. 192.
- (15) Joyce Blau, wek a jor., rûp. 29.
- (16) Joyce Blau, wek a jor., rûp. 29.

*Çiya, Hejmar 2, r. 13-14*

## Gotara-Rojê Reşo

### Civîna XI.

Îsal, di rojên 26-30/8/1966 de, Berlîna Rojava çend rojên giring jiya, deriyên xwe ji endamên "Komela Xwendikaranî Kurd le Ewropa" re vekir û navê xwe carek dî xiste nav rûpelên dîroka têkoşîna Kurdan. Endamên Komele li 16 welatên Ewropî (rojhilat û rojava) hatin Berlîn, da civîna xwe a salî bikin, bi hev bişêwrin û rewşa welatê xwe bidin ber çavên gelên cîhanê...

Ev civîna, bi her rengî, ji ên berî xwe cê dibû. Ew dubendiya ku du salan berî vê ketî bû nava şoreşgeran, li Kurdistanê Îraq, bi tewawî ketibû nava endaman û herkesî girêkê ên dî girêdabûn û xwe ji bona vê rojê şidandibûn. Merov digot ka diçin qada şer, da dijminên xwe bindest û berband bikin(!). Bi rastî ger merov bi çavekî rast bala xwe bidaya wan, xwe ji hemû girêdanên rêzanî (siyasî) bifiltanda û li quncikekî rûnişt, temaşeyî wan bikira; dil-kezewên merov ê perçe parçeyî bibûna û ê bikaribûya carek din bextreşiya Kurdistan bidîta. Ev endamana xortên li her alî Kurdistan bûn. Ev endamana wek Kurdistan bûbûn çar beş! û dîsa ev endamana doza mafên Kurd dikirin û ev endamana lîwana gelê KURD a rojên tê xistibûn destên xwe! Belê, van endamana XWEDEVAN bûn!...

Bê rojnamevanên ewropî, sê mêvanên ku di xebata Kurd de xwedî peyv bûn jî di civînê de ciyê xwe girtibûn. Du Kurd û yek jî Erebe iraqî bû. Îsmail Arif, endamê Sentral Komîteya PDK a ku bi destên Barzanî hatibû danîn: Xwe bi navê nêweriya (mûmesîl) Barzanî, PDK û a Şoreşê pêşkeş kir. Hîlmî Şerif, xwe bi navê endamê Sentral Komîteya PDK, a ser bi Î. Ehmed û C. Talabanî, pêşkeş kir. Di axaftina herdu pêşengan de ronak bû ku gora hevdi dikolan û diranên

xwe ji hevdî re disûyan. Şûna ku pî li pî li dijî dijminên zorker bixebitin û yekitiyek pêt di nava xortan kin, WANA jî her ku diçû pife êgir dikirin!..

Evana pêşengên Şoreşa Kurd bûn! û bi tenê ji bo Civîna XWENDEVANAN ew reya dûr û dirêj dabûn ber xwe û gelek dirav û DEM dabûn der, da bikaribin xwe bigînin Ewropa!..

Belê, kesek nikare xebata xwendevanan li Ewropa înkare bike, a ku di nava 10 salan de gelê Kurd tev jîna wî a civakî (sosyal) bi gelên cîhanê dan naskirin û bû ve hêzek manewî ji bo Pêşmerge. Dîsa kesek nikare înkare bike ku RASTÎ, bi tenê ji dawîya şêwîrîna a hevdî û ji hev girtina Bîr û Baweriyên derdikeve ronakî. Lê divê herkes, ên ku xwe KURD dizanin, rewşa Şoreş û a neyaran bidin ber çavên xwe û carekê, hûr û kûr, li ser bipûnîjîna, ka di demek WAHA de, ku dijmin teqeta xwe nemaye şer bike û dixwaze xwe bi erzanî ji daxwazên Kurd bifiltîne, girêdanek çiqas pêt di navbera şoreşgêr û xwendevanan de pêwîst e. Ez bawer dikim ku hemû Kurdên ku xwe dane xebata welatî, ger xwe ji bîr û baweriyên rêzanî bifiltînin û bi çavekî rasteqîn li rewşa şoreş binêrin, ê vê rastiya han bigrin û hewlbidin ji bo yekitî û serketina Şoreş. Jiber ku dilsoziya giştî têkoşerên Kurd wek avek zelal xûya ye û ez bi tewawî bawer dikim ku hemû Xwendevanên Kurd doza azadî û mafên Kurd dikin.

Ger rewşa waha ye û em hemû li ser vê deqa han dighêne hev, ji bo çî em rojekê pêşta ji bo Yekitî hewl nedin û xwe ji bo demek kurt ji giştî bîr û baweriyên rêzanî nefiltînin? Ez ji we hemû Xwendevanên "Çiya" hêvî û tika dikim ku hûn xwe hinekî ji bona pêkhatina yekitî biwestînin.

*Çiya, Hejmar 3, r. 1-2*

## Her Du Yar

Çar, bi Farsan jimartin  
Ek, du, sê û çar...  
Dijmêrin, bê xof û veşartin,  
Ji serên xwe nakin bar.

Turk dibêje: "Dört-Çar",  
Lîska wan e tewlê de.  
Deyn ji wana dibe bar,  
Rezîl dibin sermê de.

Ereb gore, ÇAR-YAR in,  
Bekir, Elî, Omer û Osman.  
Bê vê ney hişyar in,  
Ji tiştêkî nabin guman.

Bo min, ne yek: Du ÇAR in!,  
Yek AL, a din KURDÎSTAN e.  
Hevdin re ê soz û qîrar in,  
Benda xemla KURDAN e!..

**Reşo, Zurich, 25.3.1963**

*Çiya, Hejmar 3, r. 12*



## Dîn û Kurd

Bi jîna bê azadî,  
Ne ferz e rojî, şa be.  
Hec û Zekat bi birçî,  
Vî awayî cî nagre!

Berd nimêja erebî,  
Sêcde serê xwe rake.  
Dest vemegre li ber Wî,  
Guhdarî ji me nake!

Me çî dît li Zerdûştî?  
Çaviya şînek pak e.  
Cejna Newroz, bê bîrî,  
Ala çar-reng li bake!

**Berpirsiyar, München**  
**roja 27.6.1963**

*Çiya, Hejmar 3, r. 12*

## **Evîndariya Welêt**

Gazî dikim, roj û şev  
Çirî nehat, ne bangî.  
Hişê min çûn bi tev,  
Evîndarê te me, bi rastî

Berve te têm, bi rev  
Çawa min nabî xwedî?  
Bang dikim bi dil, ne bi dev,  
Evîndarê te me bi rastî.

**Reşo, Zurich, roja 24.3.1963**

*Çiya, Hejmar 3, r. 13*

## Quncikê Dîrok dûmahîka hêjmar 2

### II. Pêkhatina Rêxistinên Kurdî ên Rêzanî

Vê qunaxa dudyan di sala 1880 meha pûşper (temuz) de, bi pêkanîna "Komîteya Eşîrên Kurd" li gundê Nehrî (nêzîkî Şemdînan), dest pê kir. Hîmdanêrê wê Şêx Obeydulahê Nehrî bû. Ev malbata bi navê "Geylanîzade" jî tê naskirin. Şêx Obeydulah sergevaztirîn şêxê Sufiyên tarîqeta Neqşîbendî bû. Bavî wî, Seyîd Taha, xelîfetî dabû şêxên Barzaniyan.

Şêx Obeydulah hîn di sala 1878 de di nameyekê de ev bîr û baweriya han ji kosolê brîtanî Cochran re dabû xûyanîkirin:

"Gelê Kurd neteweyekî bi serê xwe ye."(18)

Destpêkirina hovberiya Farisan li dijî eşîrên li hêrêma, Urmîyê bû ûştîna pêkhatina vê "komîteyê". Komîtê hewl dida ku serek eşîr û pêşengên tarîqetan, ên li Turkiyê û Îranê bighîne hev. Nêzîkî 20 000 siwarî gîhan hev, di bin serdariya Şêx Obeydulah de sînore Îranê ji nîvro û rojavayî Urmîyê re derbas kirin. Li vir teve leşkerê eşîra Mangur, di bin serektiye Hamza Axa, bûn.

Lawê Obeydulah ê mezin Şêx Ebdulqadir bi leşkerekî tevlehev Sac Bulaq (Mahabad) xiste destê xwe. Piştî van serketinên pêşî li dijî leşkerên îranî, leşkerê kurda xwe şûnde kişandin. Di 1881 de jî serê xwe ji Sultan re danîn. Şêx Obeydulah avêtin Mekê. Hemze Axa kete feqek farisan û hate kuştin.

Di dawiya salên 80 de, bi xirabûna navbera Turk û Rusan, dîsa dan û standina Kurd û Rusan pêk hat. Çar Nikolas II. di sala 1889 de tev Cafer Axa, pêşengekî eşîra Şîkak, Ebdulrezaq li malbata Bedirxaniyan û Seyîd Taha torinê Obeydulah civînek kir. Lê pişgirî û

girêdana Rusan bi mesîhiyên li Turkiyê, Ermenî û Asuriyan ve dibû kelem li ber Rusan ku vejandina siyaseta kurdî ên bisilman bi xurtî bide ber xwe.

Turkan ev nexweşiya jor bona xwe karanîn û ji eşîrên Kurd ên paşverû "suwarên Hemîdî" pêk anîn ku di dema kuştina Ermeniyên (1897) de navekî pîs anîn ser xwe. Jiber ku di vê demê de Turkan li aliyê din jî Kurdên hişyar pir diêşandin, ewana jî çûn nik înlîzan li Kahîre. Kahîre di wê demê de bûbû navka azadîxwazên Efrîka û Rojhilata Navîn. Ev hêza kolînyalist ne li dijî propaganda ku li dijî Turkan dibû, bû.

Li ser vê di sala 1892 de kovara "Kurdistan" a hefteyî bi zimanê kurdî û tirkî, siftê bi destê Medhat Bedirxan û paşê jî Ebdurehman Bedirxan hate derxistin. Ciyê wê tim dihate guhartin. Ta sala 1902 li London û Folkestone, paşê jî di 1908 de dîsa li Kahire derket.(19)

Tevî vê helbestvaniya Kurd jî pêşve diçû ku Şêx Riza Talabanî bi beytên xwe ên gelêrî deng dabû.(20)

Şêx Riza (1840-1909) heyşt salan li Stambûl şagirtê Kamîl Paşa bû û li Rojhilata Navîn geriyabû ku bajarvaniya (medeniyet) Misrê bi çakî naskiribû. Li nik wî nêwerê xortan, ê kevnanjî berî gişan merov dikare navê Hacî Qadirî Koyî binî (1817-1894) ku bi helbestên xwe ên gelêr û pesindar hîn bi dilgermî tên gotin. Ew bi xwe bûbû şahidê Serxwebûna Suleymanî.(21) Herçend ku ewa pircaran wek "hawarî"yê Serxwebûna Kurdan dihate navkirin jî, wî helbestên xwe bi tuneke erebî û farisî dinivîsî, lê bi Talabanî nivîsîna paqij dest pê kir ku niha di nav ronakbîrên Kurd ên gelêr de ciyê xwe girtiye. Di dema ku Şêx Riza reşî ji bo windabûna hikumdariya Baban digirt, Hecî Qadir bêtir xwe bi aliyê raman mijûl dikir. Ew di dîwana xwe a ku sala 1925 li Bexdad hate çapkirî de Mela û Şêxan "kelem li ber vejandina mêjî" dida xûyanîkirin. (22)

Pêkhatina Saziyên Kurd ên gelêrî raste dema şoreşa "Turkên Xort"

tê, ku di vê demê de (1908) li her derên Împeretoriya Osmanî gişt gelên bindest saziyên xwe yên dizî pêktanîn. ”Komela ji bo bilindkirin û pêşvebirina Kurd”(Kürt Tealî ve Terakkî Cemiyetî) pêk hat. Pêşengên ji zabî û malbatên mezin dihatin. Merkez jî li gor vê Stambûl bû.

Di nav pêşengan de ên navdar Emîn Elî Bedirxan, Seyîd Ebdulqadir, General Şerîf Paşa û Ahmed Dul-Kafil Paşa, ê ku girêdana xwe bi hikumeta Osmanî re hebû, bûn.

Karbidestiya kovara Bedirxaniyan ”Kurdistan”, ku Emîr Sureya jî berpirsiyarekî wê bû, tev guhaztin Stambûl. Şêx Ebdulqadir jî ”Hetawî Kurd” derdêxist. Wî girêdana xwe ligel ”Turkên Xort” pêk anî û bû serekê Senato. Merov dikare armancên saziyê di bin du deqan de bicivîne ser hev:

1. Ewtonomiya Kurdî di nav sînorên dewleta Turk de.
2. Piştgiriya şoreşa ”Turkên Xort”.

Di nav xebata wan de a giring ew bû ku li Stambûl dibistanek kurdî vekiribûn, lê belê ew jî di 1909 de tev saziyê hate girtin.(23)

Rewşa pêşengên saziyê a civakî qelsî û tengiya çarçewê wê dida xûyanîkirin. Hêza wan di nav eşîrên Kurd û di nav bajaran de, bi tenê qasî hêza wan a şexsî di nav eşîrên xwe de bûn. Dubenditiya ku di navbera malbatên Bedirxan û Şemdînan de hebû pêşengên sazî kir du şîpan û xebata sazî kuşt.

Tevgera kurdî bêtir bi destên xortan ên ku wek mamoste, hûnerbend (senetkar) û xwendevan li Stambûl dijiyan dibû. Di nav wan de rêxistinên bi hêz û bi armancên gelêrî pêk dihatin. Ji van rêxistinanan ”Komela têgihêştina kurdî” (1908) û rêxistina xwendekaran a sifê ”Hêvî” (1910) pir giring in.

”Hêvî” ji bo pêşengên tevgera Kurd ên nifşa nû bû dibistanekê.

Serekê wê Xelîl Gasalê Motkî (endamê parlamena ”Turkên Xort”) bû. Endamên xwe ên nasdar, ên ku piştre bi nav û deng bûn: Memduh Selîm, Qedrî Cemîl Paşa, Omer Efendî û Fuad Temo Begê Wanî.

*Dûmahîk di hêjmarê de.*

(18) William Eagleton, The Kurdish Republik of 1946, London-New York-Toronto 1963, rûp.6-7.

William Eagleton, Diplomatekî Amerîkî bû, keys ketibû wî ku demek dirêj li Kurdistana Îranê bixebite. Herçend ku pirtûka xwe li Sovyetbû jî, pir parçeyên xwe çak bi kar tên.

(19) Binêre kovara ”Kurdistan”, gişt hêjmarên xwe ta 1914 di ”Deutschen Staatsbibliothek Berlin” de tên dîtin.

(20) Edmonds, J. C., A kurdish Lamponist, Shaikh Riza Talabanî, J.R.C.A.S., Vol. XXII, Jan. 1935.

(21) Edmonds, J. C., Kurds, Turks, and Arabs, rûp. 58.

(22) Joyce Blau, wek a berfê vê, rûp. 17. (Le Probleme kurde, Paris, 63

(23) Nikitine, Les Kurdes, Paris 1956, rûp. 195

*Çiya, Hejmar 3, r. 15-16*

## Gotara Rojê Reşo

### Ev e Zorkerî

Belê, ev e zorkerî û hovitî! Edî nizanim ê bi çî awayî gelê Kurd pişta xwe bide wan gelê ku teve wan dijî û bi wan bawer bike: Ma gelo ev xapandinên bê sinçî û bê rûmet, ê ta kînga domdarbin, û em Kurd ê 'heya kîngê vê bê heşî û dilpaqijiya xwe a bêvac berdî û neyarên xwe, ên dirinde (wehşî) û bê dilovan nasbikin?!

Erê, ev zorkerî ye û merov nikare hîç navekî din li van kirinên wan (neyaran) bike. Jiber ku ne demokratiya parlemanî, ne dîktatoriya Şahî û ne jî sosyalîstiya "erebî" ji gelê Kurd re bû yar û heval!. Divê gelê Kurd êdî vê rastiya han rind û qenc bizanibe ku ewana bi tena serê xwe nin û dorhêla xwe bi neyaran hatiye girêdan! Ev dijminên ku bi sedan sal in bêra welatê me talan dikin û tucaran naxwazin dev ji me berdin...

Gotina bav û kalar, e: "Ger tu kurtanê zêrinî ji kerêkî, ker her ew kera ye"! Em Kurd îro rastiya vê gotinê hîn rind dibînine û civê em wê navêjin rastê...

Di destpêkirina sedsalên bîstan de, pêşengên Kurdan hêviyên serxwebûna gelê xwe di hikumetên parlemanî de didîtin û xebata xwe bi têkoşîna (mûcadela) parlemanxwazên Turkan ve girêdidan, lê gava ku "Turkên Xort" hatin ser, wan dilpaqijên Kurd ew hêviyên xwe wenda kirin; bê ku xwe bi çakî amadey şerê Serxwebûnê bikin, li hember êrişên Turkan rabûn û bi hezaran keç, law, pîr û kalên Kurd hatin kuştin û malên wan, tev zar-zêç, hatin şewitandin û zarokên di zikê bûkan de derxistin û bi ser sûngiyên xwe xistin!.. Ew têkoşîn û şerên azadî li dû hev domkirin, lê herdem bi rengêkî hovitî hatin şikandin û xebata Kurdeyatî li her derekê bi salan şûnda ket.

Gava ku bi vî awayî hêviyên Kurd wek xevnên şevan di tariyê de wenda bûn, hinekan li pêşeng û ramangîrên Kurd, vê carê hêviyên xwe di rejîmên sosyalîstî de dîtî, piştî xwe dan welatên şêwrewî(sosyalîst) û destên xwe dan kesên xwedî raman û bîr-bawerîya sosyalîstî û xwestin pî li pî, tev wan bixebitin û bi wê reya han hêviyên xwe, daxwazên gelê Kurd, tev daxwazên wan bi serxin û bînin cî. Lê di van rojên bihorî de, me dîtî ku ew reya han jî ji me re ne bû yar û her ku çû neyarên me hêztir û fêlbaztir bûn!

Belê xwendevanên delal, li paş Şerê Cîhanî ê Yekan Kurdistan bi destê hêzên serketî, ên rojavayî, hate parçekirin û paşê jî di nava neyarên me Turk, Erebb û Farisan de hate parvekirin! Ew heza Kurd, a yekdestî û welatê wî, bû çar alî û ji hev din hate veqetandin û qelskirin!..

Gava em îro rewşa Kurd li hemû aliyên Kurdistan bidin ber çavan, emê xweş bibînin ku li hîç parçeyekî gelê Kurd negihêştîye mafên xwe û jînek xweş. Nemaze (bilhassa) li Kurdistana Turkiyê, ku zêdetirî heft mîlyon Kurd tê de dijîn, heya dawîya sala 1965 parçewelatê me ji bona biyaniyan (xerîwan) qedexe bû. Ne dibû ku yekî biyanî biçê Kurdistan û rewşa (hal, wez'i) wan bibîne. Tirkan bi xwe jî pir çak dizanîn ku ji bona wan şermek mezin e ku biyanî jîna Kurdan, a nexweş û paşvemayî, bibînin û li welatên xwe vê hovberîya Turkan û hebûna Kurdan li "Rojhelat" bidin ber çavên gelên Cîhane. Herwekî ku paşvemayîna Kurdistan, herwaha a Turkiye ye jî, ew riçperestî û dûrnedîtina Turkan rê nedida û nadê wan ku vê rastîya han bibînin û hîn jî ev bêvacî (ehmaqî) û bê heşîya wan dom dikê...

Herçiqas ku îro li Turkiyê, di "qanûna esasî" a sala 1961 de zmanê kurdî ne qedexe (yasaq) ye jî, pêşîya nivîsîn û xwendina kurdî hatiye girtin. Nivîsîn, axaftin û peyvîn li ser mafên Kurd bi her zmanekî gunehkarî ye. Di 14 avdar 1967 de bi derxistina qanûnek nû, karbi-



destên Turkan ”anîn û belavkirina pirtûk, rojname, kovar, sêlik (plak) û benê peyîvdar (band) ên kurdî qedexe kirin: Sê nivîskarên kovara ”Yeni Akiş”, ku bi zmanê turkî derdiket, xistin girtîgeha (hepîsxane) Enqerê û ta niha bê pîrs di wir de diminine!..

Li Îraq, ev bûn şeş sal û heşt meh in ku şoreşa Kurd dom dikê û her roj hêztir dibê. Wek hemû carên pêşî di 29.6.66 de karbidestên Îraq, bi sozdayîna mafên Kurd, rawestandina şer xwestin. Şoreşvanên Kurdistan ew daxwaza wan anîn cî û agir rawestandî û hemû girtiyên Ereba berdand. Lê ew sozên 12 deqan ku kêmîrîn maf û daxwaz bûn ji bona Pêşmergeyê leheng, ta niha bi cî nehatin!

Diyar e ku neyarên me dîsa dixwazin bi dirêjkirina demê xwe bi hêz bikin û di vê demê de jî bi fêlbaziyên xwe, ên nasber, şervanên Kurd bikin du şîpan û wan bi hevîdî bidin kuştin û ên mayî jî bi top, tank û balafirên bombeavêj bikujin û bizrê wan li rûyê erdê rakin! Bi rastî jî, ev daxwaza wan hinekî bi serket û gelek pêşeng û girêdayiyên wan bi hêla xwe xistin. Lê serpêhatiyên Kurd ên dîrokî, rê neda dubendiyek malkambax û Pêşmerge bi destekî hesinî ew şûrkêşên Ereba di nava xwe de nerîştin û Kurdistan ji wan kesan, ên qels paqij kirin. Divê ev bûyerên ber çavan li Kurdistana Nîvro çavên giştî Kurdan li herçar parçawelat vekin û heşê neyaran jî bînin serên wan ku êdî di dawîya sedsalên bîstan de ”Kolîdarî” bi ser nakeve...

.....

Ev bûn du sal in ku karbidestên Surî xwe bi sosyalîstî navdikin, xwe pêşengên Rojhelata Navîn û pêşverûyî dizanin, çend roj ser de neçûn ku hatibûn ser hikum, dest bi neyartiya gelê Kurd kirin û hewl didin sosyalîstiya xwe bi tenê li me biceribînin û bi heyîna me (malê me) birçî û belengazên xwe têr bikin. Ne ku bi tenê li dijî Kurdên Suriyê kardikin, li dijî agir rawestandina 29 hezîran 66 li Îraq jî dengê xwe bilind kirin. Navên bajar û gundên kurdî guhartin erebî- Wek kolîdarên xwe ên kevn, Turkan-. Bi dirêjîya sînorê Turkiyê-Îraqê, bi

panbûna 15 km. erd bi navê ”Kembera Erebi” ji Kurdan vala dikin. Eşîrên Erebi ên goçer û bedewî anîn kirin ciyê wan, mal û erdên Kurdan li ser Ereban belav û pardikin! Bi van kirinên xwe bend û sînorek ji merovan danîn navbera Kurdên Surî û ên li Turkiyê: Mamostayên Kurd bi destezorî şandin gundên Ereban, da zarokên wan bidin xwendin. Di 3 îlon 66 de serekê PDK (partî demokratî Kurd) li Suriyê Osman Sebrî girtin û xistin zîndana Mêzê a leşkerî (eskerî). Ew lehengê Kurd ku bi dirêjîya jîna xwe ji bo azadiya Suriyê, tev azadîxwazên Ereban, li dijî Frensiz û ji bo demokratî xebat kiribû û bi destên Frensizan bi salan li welêt hatibû dûrxistin, niha bê pirs di zîndanên de dirizê û rojên xwe di nav rewşeke kirêt de derbas dikê!.. Di 1.6.66 de jî sê Kurd hatin girtin, bi tenê jiber ku kovara Çiya a zanistî ji wan re hatibû girtin! Di 21.8.66 de dîsa 170 Kurd hatin girtin û bi dirindeyî di zîndanên de hatin eşandin...

Di ser van nerindî û şermuzariyên han de jî Sereknêroyê (serek wezîr) Suriyê di 25.12.66 de daxwaza nêwerên Kurd ku wî bibînin û bêdadimendiya (bê edalet) kirinên wan bidin ber çavan, negirt û ewana nehiştin ba xwe!..

Bi rastî êdî nizanîm ev çoyê neyaran ê ta kînga li serên mekeve ku em dijminên xwe nasbikin û bizanibin bi guhartina ”kurtan” ker ji keritiya xwe nafilte. Divê em vê yeka han bîr nebin ku ”demokratî” an jî ”sosyalistî” ya neyaran bi tenê ji bona wan û gur bi tenê DURVÊ xwe guhartiye!

*Çiya, Hejmar 4, 1967, r. 2-4*

## Quncikê Helbestan H. Reşo

### WEKHEVÎ

Ev sedsalê bîstan, qurna Şiyarî,  
Peşketin, Dewlemendî û Serxwebûn  
Bi tenê para me ye, Belengazî!  
Me divê Wekhevî, ger Doz e Rabûn

Ma gelo ne bes e, bi hezaran şal  
Em Azep û Cotkar, Şêx û Axa bûn,  
Wek Suni, Elewî, Êzidî da pal?  
Me divê Wekhevî, ger Doz e Rabûn

Bizanibe tu bindest, neyar kolî  
Çawa ji bo Maf, liwî hêvîdar î?!  
Ew wîra Hêz e, me ketin û Qelsbûn.  
Me divê Wekhevî, ger Doz e Rabûn!

Ger hebûya wî hûner, Hêz û Rûmet,  
Ne dima ta niha kolî û Bindest.  
Nabe Rawestîn, Dudilî û Sarbûn,  
Me divê Wekhevî, ger Dôz e Rabun!

Bê Hezkirin, Dilgermî û Bratî  
Pêk nayê Yekitî, Xweşî û Şabûn.  
Yek Raman, yek Daxwaz, Bîr û Bawerî  
Me divê WEKHEVÎ, ger DOZ e RABÛN!

**Nexweşgeh, 2.4.1967**

*Çiya, Hejmar 4, 1967, r. 5*

# ÊZÎNGVAN

Lo brayê Gundî, an brayê Êzingvan!  
Vê sibe birbangî, waha kuda diçî?!  
Dest te de ew bivir, li pişta te ew nan,  
Waha bi lez û bez î! Çima, ji bo çi?!

Tu Rikdar î û her bi kerb î, lê ji kê?!  
Ji dar û beran? Ji mal, an ji jinikê?!  
Şev û rôj, her dixebitî bi nanzikê,  
Lê hîc tucar, ji xwe napirsî ûşta wê!

Derdêxînî kerba zikê xwe ji daran,  
Davêjî jêr nifşê nû, ên wekî lawan.  
Bê dilêşi wan dikşînî mal, bi baran;  
Difroşî, lê dernêxî wê miza destan!

Bê veqetandin, terr û hişk, didî şewat  
Tu dikujî dêmen û rindiya welat.  
Şûv û çandinî te hiştine za û mat.  
Nezanî, Belengazî, gişt ser TE de hat!

Lo KURDO, malava, tu çiqas bê heş î  
Di her kirinên xwe de, gêj û serkêş î!  
Ji jîna merovtî û xweş, herdem bê beş î,  
Lê ji bona Neyaran, tu her ”Çavreş”î!

## H. Reşo, Nexweşgeh, 8.4.67

*Çiya, Hejmar 4, 1967, r. 6*

## WELAT

Bi çiya, deşt, şax û newal  
Çemên şên û avên zelal  
Mêrgeh, çîm û darên delal  
Çiqas dewlemend û xweş î!

Bi karkerên ku dane pal  
Rûniştvanên rût û repal  
Dewlemendên mane bê mal  
Çiqas belengaz, bêkes î!

Sîngên tijî kul û keder  
Nem û xwûn dixwaze dever  
Ta niha derneket XWEŞKER  
Çiqas tenê, bê heval î!

Derzî divê derke kulê  
Birijîne xwûn û nême  
Bikewîne wê birînê  
Çiqas teng û dilsarîn î!!

**H. Reşo, Düsseldorf, 26.12.66**

*Çiya, Hejmar 4, 1967, r. 7*

# GUNDÎ

Birayê Gundî êdî bes e  
Rabe ser xwe TU bimeşe  
Hevalê TE gîsn û das e  
Berde Beroşk û wî Sersî!

Dema çûyî êdî hew tê  
Ciyê Ewran RO hat ketê  
Divê RABÎ bi rêkevî  
Rê nepirsî ji TUKESÎ!!

**H. Reşo, Düsseldorf, 26.12.66**

*Çiya, Hejmar 4, 1967, r. 7*

## **Quncikê Dîrokê**

### ***Dûmahîka héj. 3***

Piştî mezinbûna dubenditî ni navbera malbatên Şemdînan û Bedirxaniyan de ”Roja Kurd” di sala 1910 wîrda bû kovara malbata Şemdînan Eşîrên li Kurdîstana Nîvro (ên li bakurê Îraqa niha) dûrî vê dubendiya li Stenbul mabûn. Li wir lwana gel di destên serek eşîr û serekên olî (dîmî) de bû. Di nav wan de navê Barzaniyan xwe cara yekan dide pêş. Di sala 1904 de gelek eşîran di bin serekiya şêxê Barzan û serekê tarîqeta Naqşîbendî Ebdulselam Barzanî de li dijî Turkan şoreş saz kirin. Li ser pîrsa paşayê Musulê Suleyman Wasîf ku kesekê tawanbar (sûcdar) nebe, di sala 1913 de çek berdan. Lê di sala 1914 de tev sê hevalên xwe hate dardakirin! Bi destpêkirina şerê cîhanî ê yekan tevgera Kurd a netewî li Turkiyê hate birrîn. Reya sazî û weşanên (kovar, rojname, pirtûk, h.p.) kurdî hate girtin. Sureya Bedirxan, ji bo derxistina ”Kurdistan”, careke din vegerya Kahîre.

Li Îran jî rewş bi vî tunî dom dikir. Êrişa leşkerên Çarî, ên Rus, Şah bêtir bi hêz kir. Hîn di sala 1909 de, gava ku leşkerên Rus Azerbeycana Îran xiştin bin destên xwe, pîraniya Kurdan gîhan Şoreşvanên li dijî destkariya Şahî. Nemaze eşîra Kelxor, li navçeya Kermanşah, bi çekdarî piştgiriya Şoreşvanan dikir û pir zor dida hevalbendên Şah û Çarê Rus. Eva bû ku eşîra Kelxor di hevda xist û ta niha jî hîn nehatiye serhev.

Li Kurdîstana Îran yekitiya Kurd û Turkmenan li dijî Rusan pêk hat. Piştî şikestina êrişeke Turkmenan a ser Tebrîz (dawîya 1914), leşkerê Rus di bihara 1915 de ket rojavayê Gola Urmiyê. Nezîkî Koî 3000 şerevanên eşîra Şîkak, di bin serekiya Îsmail Axa ”Simko” û Omar Xan, derketin hember wan, lê piştî pir şerên giran şerevanan xwe kişandin ser çiyayên dorhêla Urmiye (24). Piştî girtina Urmiyê,

Rusan girêdana xwe bi Asuriyên li nav bajar û navçeyê Hakkarî re pêk anîn. Di dema ku li navçeyê Sac-Bulaq li dijî Mangur û Mamaşan şer dom dikir, di peyîza 1915 de eşîrên Aşurî di bin serekiya Mar Şamun XIX. xwe kişandin deşta Salmas û Urmiye, çiyê ku di bin destên Rusan de bû. Li wir bi destên leşkerê Çarî hatin hîn-û çekdarkirin. Leşkerekî çekdar ji 6000 Asurî di bin rêberiya Rusan de pêk hat. Hebûna eşîra Şîkak li wê heremê (mîniqe) tirs dixiste ser serdestiya wan a li navçeyê Urmiyê. "Simko" ji Mar Şamun xwest ku ji bo civînê tev peyayên xwe were Kohneşar (25). Şerê ku dawî ya vê civînê derket Asurî li navçeyê Urmiye hatin avêtin. Li ser reya Hamadan di bin paraztina Înglîzan de, ewqas hatin kuştin ku hîngê virda gelê Asurî li Rojhelata Navîn pijbela bû û dengê wan hate birrîn.

Li ciye ku di bin destên Turkan de ye tenê linavrakirina (qetlîam) gelê Ermenî çê nebû. Gelê Kurd jî di bin zînata (zulm) wan de pir hate êşandin. Ev zînata bi gotinan dawî nayê. Ji 1/5 gelê Kurd ji warên xwe hatin dûrxistin û bi hezaran hatin kuştin.

Serekên Kurdan serkîniya xwestin girêdanekê bi şerleşkerên Rusan ve pêk bînin. Di sala 1916 de Kamîl Begê Botî çû Tiflîsê ba serleşkerê Qafqasê (Grossherzog) Nikolaus Konsolê Rus ê Urmiye Basile Nikitine (26) di sala 1917 de çêla nameya Seyîd Taha, xarzeyê Seyîd Ebdulqadirê Şemdînî, dike. Seyîd Taha di nameya ku bi navê Komela "Azadîkirina Kurdistan" piştgiriya leşkerên Rus ji bona Serxwebûna Kurdistan dixwaze.

Li ser Şoreşa "Oktober" sîngê Qafqas bela dibe û bi vê jî ji bo çend salên pêşta mijûlbûna Kurd a rezanî, hêzê Bakur namîne.

*Dumahîk heye...*



(24) Eagleton, W., The Kurdish Republik of 1946, rûpel: 9

(25) Eagleton, W., wek a jor, rûp. 10

(25) Nikitine, B., Les Kurdes, Paris 1956, rup. 179

*Çiya, Hejmar 4, 1967, r. 14-15*

## Gotara Rojê H. Reşo

### Jin Di Xebata Welatî de

Di dîrokê de merov pir caran raste navê jinên Kurd tê ku di rojên reş û teng de peyayên eşîra xwe civandine ser hev, şerê neyar ji bona paraztina hebûna xwe kirine. Gelek caran di kada şer de alîkariya mêrên xwe bi xurtî kirine û sîngên xwe dane ber berik û agiren neyar û teve karwanê şehîdan bûne. Paşê divê em bi ve yeka han jî gelekî serbilind bin ku bi tenê di nav gelê Kurd de hinek zarok liser navê dayikên xwe tên navandin, bangkirin û nasîn, ku ev jî di wekhevî, a mêr û jinan, mafhebûna jinan de pêşveçûna Kurdan dide xuyanîkirin. Em dibêjin: Şêr bi lepên xwe şêr e, ne bi nêrî û mekbûna xwe! Ev gotina Kurd jî vê rastiya han bêtir û zexmtir dike.

Di nivisar, pirtûk, kovar û rojnameyên welatên derve de jî pir tiştên çak li ser dayikên me hatine nivisîn û belavkirin. Di pêlweş û wêneguhazan de jî gelek gotarên pesinde hatine xwendin û pêşkeşkirin. Jiyana (hayat) wan a civakî (sosyal), ku li gor ên neyar û kolîdarên me, a aza jî di her demekê de hatiye gotin. Lê belê divê ev xweşgotin û pesindeyên vala, me şaşnekin û xwalyîê nekin çavên me ku em nikaribin rewşa jiyana wan a rast bibînin û xare ser pêwestiyên ku îro roj ji me têne xwestin bikin û bînin cî. Divê em vê yekê bi şev û roj ji bîra xwe nebin ku niha jiyana wan di tariyê de, li ber agirê argund û tendûran de derbas dibê, an jî wek mirîşkên ser hêkan, bûne makînên zarokan. Ev zarokên ku di jiyana xwe de bê nexweşiyê, belengazî, êş û taliyê tiştêkî din nabînin! Heye ku hinek xwendevanên me, ji xwe an jî ji me, bipirsin û bêjin: ”Ma gelo, em an jî tu, çawa mezin bun?” Bersîva min ev e: Birayê min, hêviya gel û welatê min! Îro di sedsalên bîstan de ku gelen din, dinê berdane, li ezmên

doş dibin û li şer hîvê digerin, ji sedî 90 gelê Kurd ji nivisîn û xwendinê û ji sedî 98 jî ji nivisîn û xwendina zmanê xwe, ê zikmakî, bê par in. Ez û hûn, an ji destên ruhistîn (felek) filitîne, an jî dewlemen-diya bavên me em gîhandine van rojan. Lê ez bawer nakim ku em jî rojek xweş û şadimanî di jiyana xwe de, a bindest de, dibînin. Her bîranînek ”rewşa gelê Kurdistan, agir bi laşên me dêxe, dil û kezewên me dişewtîne. Dibe ku hinekan li me, di zarokayiya xwe de xweşî û delalî dîtibe, ku ez jî yek li wan bûm, le ev jî wek min got nabe para her kesekî Kurd. Gelek ûştên vê henin, ku yekek ji wan nexwede bûna dayikên Kurd in.

Dîroka Kurd xweş dide xûyanîkirin ku jinên me, berî hatina Osmanîyan, diçûn dibistanan û dixwendin. Ev rewşa niha, di dema ku Osmanî hatin Kurdistan, dest pê kir û hêdî hêdî keçên Kurd dûrî dibistan û xwendinê ketin. Di wê demê de ta niha, jin bûn kevok û çûgên navmalî, ji jiyana civakî hatin qetandin û ketin gêtiyeke (dinê) reş û tarî.

Bi destjêkişandina jinan ji jiyana civakî, hêza Kurd a welatparezî jî nîvenîv, an jî betir, kem û qels bû. Ev kêmaniya han heya vî sedsalê ku em tê de dijîn dom kir û her Rabûnek Kurd, ji bona doza maf û serxwebûna welêt, bê bêr ma û agirê wê zû hate vemirandin. Her çawa ku her nexweşiyekê ûştêk û êşbirekî(derman) xwe heye, her waha ûşt û êşbira serneketinen Doz û Daxwazên Kurd jî henin. Bi bîr û baweriya min ev ûştê han jî nezaniya me ye (ne ku hatina hikmên kolîdar ên parlamenî, sosyalîstî an jî wek dibêjin demokratî) ku di ve de jî jinen Kurd dewrek gelekî mezin dilîzin. Ev dewrlîstina wan di warê:

1- Mezinkirina zarokan bi dilekî netewî û bi nasîndayina gel, serpêhatî û dîroka netewê Kurd.

2- Di reya welatparêzî de alîkariya mêran kirin.

3- Beşdarî di aboriya (iktisad) welêt de...

1- Gava dayikên me xwende û zanebin, ev jiyana bindest û nîrê kolîdarên zorkeran ê dilê wan bişewtîne, hişyar û gelperest bike, ku êdî êşa kezewê (zarokan) di bîra wan de namîne û di bin daxwaza doz û ramana azadî de dilê wan ê lêbixe. Gava ev gelperestiya ciyê xwe di dilên dayikên Kurd de bigre, nema kesek an jî hezek dikare pêşî û devê wan bigre û wan bê deng bihêle. Zarokên Kurd jî ê bi vî rengî di bin gotinên dayiken xwe de bi hişyarî mezin û gir bibin, bi kurdî werin navkirin, zorkeriya kolîdarên xwe û mafhebûna gelê Kurd binasin, bindestî û bextreşiya xwe bibînin û dîroka xwe hîn bibin û bizanibin. Gotinek heye ku di devên gişt mezin û peşengên gelan de buye benîşt ku ev e: ”Xortên îro, mezinên beyanî (sibe)nin”. Ev gotina be şik rast e, lê divê em bîra nekin ku ”zarokên îro” jî ”xortên beyanî”nin û mezinên peşende (musteqbel, duwaroj)nin!

2- Dîsa, gava jinên Kurd zane û hişyarbin, ne ku ewna ê bibin kelem li sex• reya mêrên xwe, bi vacayî ê bibin ”piyê wan ê rastê” û alîkariya wan bikin. Li çiyê ku ”gotûgot”kin, e bi axaftinên zane û pesinde, dilgermî û jîrekiya mêrên xwe di xebata netewî de zedetir û bêtir bikin. Weke ku em gişt rind dizanin, gava rewşa mal de nexweşî hebe û bêdengî (îstiqrar) tunnebe, qelsî û kelemekî pir giran û mezin e. Nemaze, gava jin û zarok bi ramana merov ne bawerbin, jiyana di mal de ji zîndanên tengtir û diwartir e û nayê kişandin.

3- Di xebata netewî de, dewlemendiya gel, hêzekî giran e. Aboriya welatekî jî bi kar û karkirina rûniştvanên wî welatî çak dibe û jiyana kesan bilind û xweştir dibe. Gava em gelê Kurd tînin ber çavên xwe, ricîfk dikeve dil, çav tijî stêrk dibin. Ew belengaziya gelê Kurd, ku merov bi penûsê nikare binivîsîne, li aliyekî; bê karî û nezaiya wan jî li aliyê din. Li Kurdistan, a rast ew e ku, bav bi tayê serê xwe gişt barên malê dide ser milên xwe, jin û zarok li ser piştê wî dijîn: Jiber vê yeka han, di ser û mêjiyê wî de bi tenê xwedîkirina zar-zêç û filitandina mal û paraztina serbilindî û rûmetê wêdatir tiştêk tunneye. Wekî din tiştêk nikare were bîra wî û her waha ger bixwaze jî, ji hêza

wî bi der e. Lê gava jinên Kurd, ku tev wan zarok jî, zû pê dighên, dikarin bi dîtina reyeke karkirin an bi tunekî din bixebitin û hinek çûyîna (mesref) malê bigrin ser xwe. Wekî din, dikarin xwe ji pirkirina zarokan biparêzin û giranbihabûna zarokan jî bizanibin û bîr nekin û wana ji nexweşiyên biparezin û bifiltînin.

Em dibînin ku di xebata netewî (mîllî) de bar û parekî perest û mezin dikevê ser jinan, ku min ji kêmbûna cî bi kurtî li gor karîna û zanîna xwe nivisîn. Divê em Kurd vê yeka han her dem bînin ber çavên xwe û giringiya wan bizanibin, bi hewldanek dilgerm û kurdeyatî reya dibistan û zanîngehan ji keçên xwe re, nik lawan vekin. Dîsa bikin serê xwe ku ZAROKÊN ÎRO, XORTÊN BEYANÎ Û XORTÊN ÎRO JÎ MEZINÊN PÊŞENDEY KURDISTAN ÎN. Eva jî xebatek giranbiha û perest e ji bona rojên serxwebûna gel û welat.

*Çiya, Hejmar 5, 1968, r.1- 2*

# Herçar Dest

## H. Reşo

*Ji bo civîna KXKE li*

*Belgrad, 27/31.12.1967*

Rabin gelî Kurmanc û Zaza, Feylî û Soran  
Destên xwe bidin hev û rawestin mîna şêran!  
Nabe têkev nava we, neyartî wek gişt caran  
Bi navê O1 û Partî, Zarava û Eşîran!

Divê HÛN berdin, birevin ji van navên KEVNAR  
Ku hatine danîn, bi destên Noker û NEYAR.  
Bûn benîştê bijangan, ketin nav gund û bajar,  
Em kûr kirin, kişandin, mîna cendirmên seyâr!

Nabe carek din, ji bo hîç û pûç bibin GORÎ  
Ku zorker şa bibin, laşên me bikşînin LORÎ.  
Di nav zar û zêçan de, ji me bikin çavsorî  
Divê em bizanibin, ew rojên REŞ bihori!

Dujmin jî ÇAK dizanin, ku em bira û Kurd in  
Lê mijulgeha wan tijî XÎNÎZÎ û FÊND in.  
Bi hezaran sal in, ji me re BOBLAT û KUND in  
Kurmê nerindiyê herdem, di nav me de çandin!

Bizanibe, bi şev û roj, xew nakeve çavên wan  
Dibizdin, her dibînin, xevna rabûna Kurdan.  
Nasdikin, dizanin hêz û petbûna Lawan  
Bi girêdanek pêt, dest dane hev, bi şert û sondan!

Bidin hev herçar DEST, meqetin, bermedin yekcar!  
YEKÎTÎ, şîna hez û jin e, bîrmebin tucar!  
Bikşînin kevîrên Hîm, HÛN bibin NECAR  
Lêbikin "BÎRCA BELEK", bê wê memînin hercar!

*Çiya, Hejmar 5, 1968, r.9*

## Pêşmerge

Birayên min, dil û kezewên KURDÎSTAN,  
Mêrxwasên min, lehengên qurneya bîstan  
Hêvî û serbilindiya hemû Kurdan  
Destmiza we ye, azadî li Niştiman!

Dixwazim bi dil maçkim, wan ling û destan!...  
Her çend, bê dil, evqas dûrî welat im  
Bi mêjî û xwûn wilo nêzîkî xak im.  
Ger bi pêûsa xwe bikarim we şakim,

Paşmerge me, lê dîsa rolekî çak im  
Ji bo ramana XWE, hîç NOKERÎ nakim!  
Eva çi ye "RAST û ÇEP"? Em tev de KURD in!  
Tena XWE, bêrûmet, sernizm û destkurt in,

Bi yekitiyek rast, serfîraz û xurt in  
Van reyên çepel û şaş, di nav de rakin  
Ala biratiyê li her derê bakin!  
Ew kesên ku bûne ÇAŞ, NOKER û "FURSAN"

Dane ser milên xwe, ew kurtanê keran  
Li wan pîroz be, bila bikîşînin baran!  
Lê divê bîrnekin her, wan "hersê daran",  
Da bibin "Poxli Şehîd", wek hemû caran!

*8.1967, Nexweşgeh, Berlin.*

*Çiya, Hejmar 5, 1968, r.9-10*



## Nandoz

Lo NANDOZ, tu kê dixwapînî,  
Wek kewê neçîr, pozbixwun î  
Çîpên sor bi berfê vedşêrînî  
Lê li reşayê derewîn î?!

Çira derewîn, ne domdar e  
Tarî, Rûreşi her jê bar e  
Hemû nerindiya dikare  
Wekî din î herdem bê kar e!

Te girte saldaniya welat  
Bi wê xwend û him girte xelat,  
Heya te dest xwe xist ew berat  
Tu Kurd bûy, bi dilekî şewat!..

Lê gav bûyî xwedî jin û mal  
Kurd û Kurdistan, bi te bûn tal.  
Te got ka ên mayî gişt zar-mindal  
Xebata welat bê te da pal!

Waha nîne xiniz, ho NANDOZ!  
Nabe bibî dilşa û rûboz,  
Divê bimînî rûreş û çavkoz  
De birroo xirpo, nema te ma koz!

*Saldanî: zemale an burs.*

*Xelat: li vir Şadetname ye.*

*Berat: li vir rêdana kar e.*

***Nexweşgeh, -.8.1967***

*Çiya, Hejmar 5, 1968, r.10*

## Destdirêj

Destdirêj, dujminê gelê min ê bi sedan sal  
Bê şerm û fihet li ser sîngê jîna min da pal  
Te xwar, tu nedirrî û ne jî bûyî pîr û kal  
Te divê careke din bibînî Rustemê Zal?!

Ez dizanim, bi dilxweşî kormê bernadî  
Ta ew deştên te ên dirêj, kurt nebin bi şadî  
Tajana tîra gelêr, nekeve dil bi başî  
Naxwazî rast bibînî, her li ser reya şaş î!

LO DESTDÎRÊJ! Tu bizdok î û çak jî dizanî  
Dî kada şer de her REVOK û qelş û xiniz î  
Lê dujmin, neyar û lîwana me bû NEZANÎ  
Û hêz û hunerên te bûn ew fêl û şeytanî!

Bizanibe, tenê em mane bê AL û bê SER  
Çavvekirî û şiyar, em dikşînine keser  
Bilezîne, bireve, hîn ku RO heye li der  
Ger TARÎ bibe, tu binbar î, menere wek KER!

*Binbar î: tawanbar, gunehkar an jî suçdarî.*

*Nexweşgeh, -8.1967*

*Çiya, Hejmar 5, 1968, r.10-11*

## Navên kurdî:

**Ên keçan:** Dilaran, Pexşan, Reşxan, Esmer, Xwunav, Bahar, Hêvî, Hingur, Jala, Nazdar, Rûken, Xwûngerm, Hemîn, Nesrîn, Şermîn, Nermîn, Şîrîn, Befrîn, Dilvîn, Evîn, Silêr, Peyman, Viyan, Jiyan, Ciwan, Zozan, Gulzar, Gulcîn, Biskan, Nazenîn, Aşîne, Narîn, Naz, Nazê, Besê, Nazik, Kurdistan, Beyan, Nişê, Temîn, Xaniçe, Gulan, Xanzad, Neslixan, Dilxwaz, Zêrîn, Zerî, Zerê, Zara, Zêrê, Zivîn, Dilsoz, Newroz, Pîrşing, Tavîn, Nexşîn, Ronak, Rewşen, Bêrîvan, Daxwaz, Ronahî, Serva, Perîxan, Pakîze, Suzan, Sorgul, Susin, Dilxweş, Dilgerm, Zîn, Zînê, Newal, Nalîn, Darîn...

**Navên Kur û lawan:** Dilêr, Aza, Azad, Şêzrad, Dildar, Metîn, Serhing, Serdar, Serçil, Serbest, Saman, Serket, Behzad, Deştî, Şaxwawan, Darawan, Cotkar, Pîrot, Çîprût, Xoşnav, Çalak, Jîrek, Lawçak, Bapîr, Aşitî, Heriş, Ferhad, Şemal, Kawa, Lezgîn, Bengîn, Piştîmêr, Dengîr, Bêkes, Şêrko, Qubat, Salar, Xakî, Merîwan, Goran, Kamuran, Helmet, Ziwêr, Wirya, Solav, Hawar, Hêmin, Serwer, Leheng, Pêşeng, Rêber, Rêwî, Erdeşêr, Sîrwan, Şêrwan, Lawko, Mîdya, Kurmanc, Soran, Zaza, Şoreş, Şivan, Hişyar, Brusk, Dîlawer, Simko, Serçêw, Dara, Dilşad, Xesrew, Kurdo, Helkewt, Rizgar, Nebez, Mêrxas, Serroj, Siyamend, Hêjar, Cêgerxwûn, Sîroz, Koçer, Helbest, Sertîp, Serdest, Reşo, Hemreş, Welat, Hoşeng, Şengo, Hoşîn, Çeleng...

*Çiya, Hejmar 5, 1968, r.12-13*

## Nûçeyên Welêt

**Kurdîstana Navîn (surî):** Di 1.5.1967 de mûdîrê nahya Amûdê tev mifrezek polîs, mifrezek leşkerên bedewî û "heres qewmî" êriş birin ser gundê Elî Firo. 5 cotkar bi berrîkên (qurşûnan) mûdîr brîndar bûn, Ebîd Şerîf brîna xwe pir giran bû. 40 kes girtin û avêtin girtîgeha Qamûşli.

3.5.67 polîsê dizî êriş birin ser gundê Nîv û 3 kes girtin û birin ba ên jorin. Jiber ku jinên du gundan bê mêr mabûn û ji namûsên xwe ditirsîn, dev ji gundên xwe berdan û gund vala man. Polîs û leşkerên bedewî ketin gundên vala û talan kirin. Ser van bûyeran de jî 7 kes li Tirbe-Spî girtin. 13 kesên dî li gundê Maşuq, 13 kes li gundê Tilxatunek hatin girtin. Çend kes jî li Swedya girtin. Xwarinê nadin girtiyan. Ewana bi tenê dikarin ji kîskên xwe bijîn. Di nav wan de jî hinek birîndar hebûn. Girtin dom dikê û girtiyên Kurd bi renekî dirindeyî têne êşandin.

18.10.67 Osman Sebrî, têkoşer û lehengê Kurd hate girtin û menfî kirin û şandin sînorê Êrdûn û Îsraîl û ta niha li wir di bin çavneîna polîs de ye.

3.1.68 "M", nêwerê PD Kurd li Suriyê li ser sînorê Suriyê hate girtin û ta niha di bin dara de ye.

**KURDÎSTANA NÎVRO:** Jiber ku karbidestên Îraq sozên xwe nehânîn cî û dest bi fêlbaziyen bê sinçî kirin, şoreşgerên Kurd jimara Pêşmerge pirtir kirin, çeken nû bi dest xwe xistin û amedey şerê azadî kirin.

8.1.68 şerekî çûk di nava Pêşmerge û leşkerê Îraq de çê bû, neyar 5 esker û zabitek esîr da û xwe şûnde kişand. Şoreşê berpirsiyariya vî şerî xiste hustiyê hikûmet û ji wan xwest ku bi lez û bez sozên xwe bînin cî. General M. M. Barzanî bi nameyekê ji serek komara (cumhuriyet) Frensa Di Gol re da xûyanîkirin ku divê ii ser hatina

serek komara Îraq, A. Arif çekan nefroşe Îraq û divê bizanibe ku ewana dixwazin van çekan li dijî Kurdan bi karbînin.

**KURDÎSTANA ROJHELAT:** Li gor bîstina me di nav van rojan de dîsa şerevanên Kurd dest bi şer li dijî leşkerên Şah kirine û di pir şeran de jî bi serketine.

**KURDÎSTANA BAKUR:** 13.8.67 li Sîlvan birayên me dengên xwe li dijî Toraniyan bilind kirin. 15 hezar kes li herçar alî Kurdistana Bakur hatibûn. Hevalan helbestên kurdî xwendin. Gundiyên ku dixwestin werin, bi zora çu û çekan şûnda vegerandin.

3.9.67 li Diyarbekir 20-25 hezar biraderên me dîsa dengê xwe bilind kirin û li karbidestên Turkan mafên xwe ên merovtiyê xwestin. 5 kes hatin girtin (Edip Karahan, Bahri Koçkaya, Sait Elçi, Hasan Akkuş û Cahit Ülgen). Piştî pênc rojan bû H. Akkuşu ên din hatin berdan. Jiber ku kesek nikare rewşa kek H. Akkuşu bizanibe, li Enqerê (Ankara) belavokeke 22 îmzayî hevalan derxistin û berdana birader xwestin.

24.9.67 de li Siverek 5-10 hezar Kurd gihêşte hev û li dijî zorkerîya karbidestên Toranî dengê xwe bilind kirin. Belavoka ku Xwendekarên Kurd li Zanîngeha Enqerê derxistibun, hatin komkirin û qedexekirin. Komîte jiber vê "pankartê" hatibû girtin: "Xwediyên Mezopotamya bi tenê Kurd in" (Batman).

8.10.67 li Batman jî biraderan daxwazên xwe dan ber çavên koran.

22.10.67 de jî li Agrî ev daxwazana domkirin.

18.11.67 de jî Xwendekaren Kurd li Enqerê dengê xwe bilind kirin. Gava ku serek komara Turkiyê C. Sunay çu Emerîka ba Johnson, li hember xwe rojnama resmî (Resmi Gazete) a 25.2.67 ku hertiştên çapkîrî bi zmanê kurdî bi qanûnekê hatibû qedexekirin, tev wergera wê dît û li ba hevalê xwe Johnson jî dît!

Li ser reya xwe hate Paris û li wir jî Kurd û rojnamevanên firensî li hember xwe dîtin! Ew kerba ku ketibû dil û zikê ewa gihande Hakkari û Bitlisê û bajarên din ên Kurdistana Bakur. Gava ku li van derana jî kesek bervê nehat (îstîqbal) û ên ku hatin jî li dijî wî bang kirin, ew bi zêhfkirin revî Enqerê. Di van rojan de nêzîkî 50 kes li Kurdên zana û têkoşer hâtin girtin û hêj girtina Kurdan û bi dirindeyî (hov, wehşî) lêxistin û lêdana wan dom dike. Bi gotina wan, ewana endamê PDK li Turkiyê nin!

**Ewropa:** Di 11.9.67 de Saleh Yusefî tev 4 rojnamevanên Ereban xwendiyê hikumeta Sovyet bûn. Karbidestên Moskow re da û stand û qedra xwe li ba wan pir mezin bû. Di 21.9.67 de xatir li hevalan xwest û çû Lenîngrad û Baku. Bi gotina wî hêza Pêşmerge, şerevanên Kurd, gelekî zêdetir bû ye, Erebi jî baweriya xwe ji hikumeta xwe betir bi Pêşmerge heye.

Li Siwêd (isveç) ta niha nêzîkî 2 mîlyon Kron derman ji bona Kurdistan hate civandin. Kitêbek bi navê "The Forth war" li ser Şoreş derxistin û bi pereyên wê dixwazin nexweşgehekê ji bo Kurdistan bikin.

Gelê Îslandî jî dixwaze nexweşgehêke diyarî Kurdistan bike. 27/31.12.67 de li Belgrad Kongra KXKE (Komela Xwendikaranî Kurd le Ewropa) pêk hat, pêşengên Kurd hatibûn.

*Çiya, Hejmar 5, 1968, r.14-16*

## Gotinên kurdî

Pîrê bawer nekir ku ê mêr bike, gava ku mêr kir jî, jê heyştekan doz kirin.

Bilbil kirine qufika zêrînî, dîsa tim gotiye: "Ax Welat"!

Qûna reş û spî, li ber gêçût diyar dibe.

Dest ji neyarê ku xwe avêtiye malê re ranabe.

Şêr dikeve, dibe lîska roviyan.

Mirî dibejin ka zindî tim nan û goşt dixwun.

Mirin mirin e, va çi xirxira gewriyê ye?

Sal çi ne? Wek merov komê xwe carekê bade (bizvirîne).

Merovên kor şerm nakin.

Bi zmanê xweşik, mar ji qula xwe dertê.

Devê xelkê ne qula merov e ku bikaribî dest bidî ser.

Şertê mêraniye sê car in.

*Çiya, Hejmar 5, 1968, r.17*

# Bersîva min

## Reşo

Xwendevanên delal!

We nameya kek ”Misto” xwend, xweş diyar e ku dixwaze hûn biryar li ser rexneyên wî û bersîva min bidin. Em daxwaza birader bi çap û belavkirina nameya wî û bi bersîvdana rexneyen wî bi dilxweşî tînin cî. Em hêvîdar in ku hûn xweş hûnlêbinêrin û bixwînin û biryara xwe bidin.

Dibe ku hêjmar 3 û 4 ên Çiya li ba we tunebin, ez dixwazim wan paragrafên ku kek M. çend rêzik lê derxistine û rexne lê girêdane carek din binivînim. Min di gotara xwe a hêjmar 3 de gotîbû:

”Bêj li rojnamevanên ewropî, sê mêvanên ku di xebata Kurd de xwedî peyv jî di civînê de ciyê xwe girtibûn. Du Kurd û yek jî Erebbî iraqî bû. Îsmâil Arif, endamê Sentral Komîteya PDK (Partî Demokratî Kurdistan) a ku bi destên Barzanî hatibû danîn, xwe bi navê nêweriya (mûmesil) Barzanî, PDK û a Şoreşê pêşkeş kir. Hîlmî Şerîf, xwe bi navê endamê Sentral Komîteya PDK, a ser bi Î. Ehmed û C. Talabanî, pêşkeş kir. Di axaftina her du pêşengan de ronak bû ku gora hevdin dikolan û diranên *xwe* ji hevdin re disûyan. Şûna ku pî li pî, li dijî dijminên zorker bixebitin û yekitiyek pêt di nava xortan kin, wana jî herku diçû pîfe êgir dikirin.”

Wek hûn dibînin, min di vir de rexneyên xwe, ji herdu mêvanan girtiye û şaşiyen wan dane ber çavên xwendevanan. Lê kek M. kurdî *çak* dikare bixwîne.(di Civîna 12 de gava min rapora xwe a salî-liqê Berlîna Rojava- xwend, wî pirsên xwe bi erebbî li min dikirin, ku wî çak dizanî ez erebbî nizanîm) Gava bikaribûya ê bidîtiya ku min nivîsiye ”Î. Arif XWE bi navê. PDK pêşkeş kir.” A dudyan, jiber ku



kesan bi navê Partî peyivîn, min xwest ku xwendevanên me bizanibin ka kî bi nave kîjan Partiyê peyivîn an peyiviye. Jiber vê yekê min navê general Barzanî, serekê leşkerê azadiya Kurdistan û Î. Ehmed û ên din anî bû. Paşê hemu biraderên ku hatibûn Civîna 11. (ku kek M. nehatî bû) dizanin ku ew komîteya ku hatibû hilbijartin bi dengê tenê serket û hatibû hilbijartin. Ew dengê han bû ûçma (sebeb) ku şeş hevalên aliyekî û yekî serbixwe (bêteref) têkevin komîtê û ji nêwerên % 49 yê endamên amadebûyî nikarîn tekevin komîteya Komelê Paşê ew biraderê serbixwe naskir ku reya wan şaş bû, xwe ji komîtê kişand û derket. Dîsan di Civîna Belgrad, a 12 de, xweş derket ku biraderên di Civîna 11 de dengê xwe dabûn wan êdî nedan wan. Gava ku komîteyek bi tewawî piştgiriya aliyekî bike, çawa em bi belavoka wan a dawî Civînê rast bizanibin û pê bawer bikin!

Em werin ser gotara min a di hêjmar 4 de hatibû belavkirin: ”Diyar e ku neyarên me dîsa dixwazin bi dirêjkirina demê, xwe bi hez bikin û di vê demê de jî bi fêlbaziyên xwe ên nasber şervanên Kurd bikin du şîpan û wan bi hevdivin bidin kuştin û ên mayî jî bi top, tank û bala-firên bombeavêj bikujin û bizrê (neslê) wan li rûye erdê rakin! Bi rastî jî ev daxwaza wan hinekî bi serket û gelek pêşeng û girêdayiyên wan bi hêla xwe xistin. Lê serpêhatiyên Kurd ên dîrokî re neda dubendiyek malkambax û Pêşmerge bi destekî hesinî ew şûrkeşên Ereban di nava xwe de nehiştin û Kurdistan ji .wan kesan ên qels paqij kirin. Divê ev bûyerên ber çavan li Kurdistana Nîvro çavên gişt Kurdan li herçar Parçewelat vekin û heşê neyaran jî bînin serên wan ku êdî di dawîya sedsalên bîstan de Kolîdarî bi ser nakeve...”

Wek hûn dibînin li xweşiya kek M. nayê ku merov di gotarekê de li ser rastiye binivîse û vê rastiya han ”Dev avêtina kesan” dîzanê. Nayê bîra wî ku bi vî rengî, bi xwe dev davêjê kovar û nivîskarên wê. Bîr û baweriya min ew e ku gava merov gotarek nivîsî, divê merov li gor zanebûn û karîna xwe rastî û tiştên ku xwendevan pê

destkewtî bibin binivîsîne. Ger ne waha be, biha û ûştâ gotarekê ê bi çî rengî were nasîn, zanîn û pîvan? Ez dîsa dibêjim ku ew kesên bi Ereban hatin xapîn, li dijî Şoreş rabûn û bûn ûştâ kuştina bi sedan Pêşmerge, ên bê guneh û dîsa bi bûyîna ûştâ Dubendî di nava Kurdan de, şûrkeşên Ereban in. Min navên kesekî nehaniye û ew kesên ku van nerindiyana kirine divyabû eciz bibûna û li xelitên xwe vegeyriyana. Ez nizanim bo çî kek M. van gotinana digre ser xwe û pê dilşikestî dibe. Ger min rast bizanibûya, min dikarî navên wan kesana jî bînim û bi kirinên wan derxim ku ewana bi rastî di reyek şaş de çûn û diçin. Lê jiber ku pir kesên dilsoz henin ku bi şaş û rastînezanî teve qelfê wan bûne, naxwazim eciz bikim. Di xebata me û serektayîya Şoreş a salekê de xweş derket ku li Ewropa û welat pir heval vegeyriyan ser reya Şoreş. Em hêvîdar in ku bi xwe jî vê reya çepel û şaş berdî û vegeyriyan Şoreş û rê nedin neyaran ku keysbazî li gel û Pêşmergeyê leheng bikin.

*Çiya, Hejmar 5, 1968, r.19-20*

## **Quncikê dîrokê Dûmahîka hêj.4**

### **III. Têkoşîna Kurd a Serxwebûnê**

Dawiya Şerê Cihanî ê yekan gelek taw û hêvî ji Kurdan re anî. Herse dewletên Rohelata Navîn binketî bûn, Çaritiya Rus ketibû, Împaratoriya Fars bi şerên Rus-Turk û Îngliz li ser welatê wan di nav de rabû bû û hatibû verişandin. Bi binketina Hêzên Navber jî Turk mecburî îmzakirina Mondros bû bû.

Sureya Bedirxan di vê demê de li Kahîre "Komîteyê Serxwebûna Kurdistan" danî. Li Kâhta (nêzîkî Malatya) di sala (27) 1919 de serek eşîrên li dijî Turkan çivîyan hev. Li Îstanbul, gelek rêxistin pêk hatin ku vana hêzên Kurdî civakî ên renga reng didan ber çavan. Heryekî ji wan hewl dida ku xwe wek rêxistinên berî Şerê Cihanî bidin xûyanî-kirin. Endamên "Hêvî" di bin serekiya Mamduh Selîm, Hamza Efen-dî û Kemal Fewzî, ên ku paş çend salan bi destên Turkan hatin dar-xistin, xwe civandin hev. (28) ,,

Di "Komela Taalî Kurdistan" de tevgereke nerm pêk hatubû, lê hîn di sala 1919 de jiber dubendiya Şemdînan û Bedirxaniya bû du şîp. Hevalbendên Şemdînan, di bin serekiya Şêx Ebdulqadir de, "Partiya gelê Kurd" û ên Bedirxaniyan "Rêxistinên civakî ên Kurd" pêk anîn.

Di "Partiya Gelê Kurd" de kesên malbatên Kurd li Îstanbul civîyan ser hev û aliyê Bedirxaniyan ronakbîrên Kurd û eşîrên li Bakur-Rohelât bûn.

Gava ku Îstanbul kete destên Kemalîstan, ev rêxistanana gişt ketin xebata binerdî. Ewtonomiya Kurd li roavaye Gola Urmiye jî di vê demê li nav rabû. Di sala 1919 de "Simko" wek waliyê vê heremê hatibû naskirin. Wî dixwest Parçe-Kurdistana Îrane gişt têxe bin

destên xwe û di 1921 de êriş bir ser leşkerê îranî li Sac-Bulaq. Di van êrişên xwe de bi êşandina Azerbeycaniya eşîrên wan ên Tirk Şahsewîn piştgiriya leşkerê îranî kirin. (29) ,,

Van şerevanên ”Simko” ta ser Çiyan birin û avêtin piştî sînorê Turkiyê. Ev şerên ”Simko” ta sala 1930, ku bi gotina zabitekî îranî hate xapîn, li ser reya Mahabat, di kozikek îranî de dawî hat. Wî dixwest ku xwe bide destê hikumeta îranî.

Eşîrên Kurd bi heviya ku Înglîz jî alîkariya wan bike, li Suleymanî di bin serekiya Şêx Mahmudê Berzincî de civiyan ser hev ku Kurdistana Nîvro (hersê wîlayetên Turkan ên kev, Erbîl, Musul û Suleymanî) aza bikin. Hinek li siyaseta wan bi hêviya ku Înglîz Turkiyê parçe bike ve hatibû girêdan. Gava ku ev hêviya wan bi destavêtina şoreşa Turk a gelê Turk a netewî di bin serekiya Kemal Paşa de, wenda bû, di vîya bû ku mafê Kurdan bi renekî hindikî di nav wê dewletê de bihata nasîn.

Hikumeta Osmanî ku şer wenda kir, bi hevhatina Sevres (10.8.1920) de Ewtonomiya Kurd û gava gel xwest jî Serxwebûna Kurdan dida (30). Serketina Kemalîstan ev hêviya Kurdan jî şikand. Hevhatina nû a Lausanne (Lozan) (31) bi tenê mafê peyvîna zimanê zikmakî û hin xebat ji çand didan.

Di konferansa Lozan de nêwerên Turk, nemaze İsmet İnönü, ku bi xwe jî li malbateke Kurd e, digot ”Turkiye welatê du gelan e, ku ewana jî Kurd û Turk in. Jiber ku İnönü dixwest ku wîlayetên Kurdistana Nîvro, nemaze bajarê Musul ê petrol, bi van gotinan dest Înglîz ve bernede xwe Kurdxwaz dida xûyanîkirin.

Paşê Turk hewceyê piştgîriya Kurdan bûn ji bo şerê Yunaniyan. Ev bû ku nimînendeyê (mebus) Erzurum Huseyin Awnî Begê karî di parlamana Turkiyê de bêje:

”Rûniştvanên vî welatî Kurd û Turk in. Di vir de du gelan mafê xwe

heye ku dengê xwe bilind bikin ku evana jî gelê Kurd û Turk e.(32)

Piştî Hevhatina Lozan, ew hezkirina nema. Di sala 1924 de, di helbijartina Parlamento de gelek nimînendeyên Kurd hatin girtin û gelek ji wan jî bi comerdî hatin kuştin. Ciyê wan Turk hatin ketine. Dibistan hatin girtin û Demnivîs (kovar, rojname.. h.p.) hatin qedexekirin.

Nêzîk Diyarbekir, gundî û şivanan di bin serekiya Şêx Seîd de, li dijî vê hovberiya Turkan serê xwe rakirin. Turkan ev rabûna, rabûnek olwerî dan naskirin (33) û ew qedexekirina bi xwe re bi kar anîn.

Rastiya ku gerînendeyê (organîzator) vê rabûne kurdên di nav leşkerê Turkande bûn, hate veşartin. Ev zabitên Kurd di bin serekiya serhing Xalidê Cîbranî xwe amedey vê rabûna netewî kiribûn, le bi xiniziya polisên Turk ketibûn dest (34).

Pêşengiya serekên tarîqetan û rêxistinên olwerî di xebata azadî de, ne bi tenê di nav Kurdan de heye, ev xususiyeteke gişt gelên paştamayî, bindest û gundî ye.

Bi derxistina ”seferberligî” hikumeta Turka karî piştî salekê pêşiya Rabûnê bigre û vemirîne. (35) ,,

Di vê demê de Înglîz Kurdîstana-Nîvro û Frensîzan jî Kurdîstana-Navîn kirin bin destên xwe. Firensîzan bi vê parçeyekî tev 400 000 Kurd teve kolonîya xwe Suriyê kiribûn. Li Suriyê gişt gelan, bi destyekî, li dijî neyarên xwe ê kolîdar şer kirin ku ev xebata dijî neyar li Suriyê bêtirî xebatên li parçewelatên din bû. Nemaze çend malbatên Kurd li Şam pêşengiya vê xebatê dikirin. Li Îraq herçend ku Xwehesîna Netewî bêtir pêşta çûbû jî, ezperestiya eşîrtî zîndetir bû. Di wê demê de navçeyên tevgera Kurdeyatî (piştî Şerê Cîhanî I.) Suleymanî tev aliyê Berzincî û herêma Zîbar û Barzan bûn.

*Dûmahîk di hêj. 6 de*

(27) - Nikitine, B., Les Kurdes, Paris 1956, rûpel 1y6

- (28) - Kurdo Agir, Kurdistan ath-Tha'ira, Berlin 1963 (Manuskript).  
Rêxistinên ev bûn: Kurd Taali Cemiyeti, tev Emin Aali, Kamuran Ali Beg.  
Ev bû du sîp: A bi Abdulqadir dihate nasîn "Kurd Millet Fırqasi" û a  
Bedirxaniyan "Kurd Teskilati içtimaye Cemiyeti" bu.
- (29) - Eagleton, W., The Kurdish Republik of 1946, London-New York-  
Toronto 1963, rûpel 11.
- (30) - Hevhatina Sévres, III. Paragraf 62 û 64. (31) - Hevhatina Lausanne  
(Lozan), paragraf 38-44.
- (32) - Kamuran Bedirxan, La Question Kurde. Paris o. J. rûpel 9.
- (33) - Kurdish Facts and West Asian Affairs. Amsterdam, Nîsan 1961, rûp.  
10
- (34) - İsmet Şerîf Vanly, North Kurdistan; Anatolia and 1925 uprising. Di  
Kurdish Facts and West Asian Affairs. Amsterdam, 7 June 1961, rûp. 2
- (35) - Kurdistan auf dem Weg zur Freiheit, August 1962, rûp. 3

*Çiya, Hejmar 5, 1968, r.22-23*